

# Di Navbera Çanda Nivîskî û Devkî da Beyta Feqîyê Teyran

## Between Written and Oral Culture the Bayt of Feqiyê Teyran

Yaşar KAPLAN\*

KAPLAN, Yaşar, (2022), "Di Navbera Çanda Nivîskî û Devkî da Beyta Feqiyê Teyran", Nûbihar Akademî, no. 18, p. 11-45, DOI: 10.55253/2022.nubihar.1215773

**Genre/Cure:** ResearchArticle/  
Gotara Lêkolîni

**Received/ Hatîn:**  
07/12/2022

**Accepted/ Pejirandin:**  
12/12/2022

**Published/ Weşandin:**  
31/12/2022

**ORCID:**  
0000-0002-3960-0201

**Plagiarism/Întihal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website./ Ev gotar herî kêr ji aliyê 2 hakeman ve hatiye nirxandin û di malpera întihalê ithenticate re hatiye derbaskirin.

### PUXTE:

Feqiyê Teyran yek ji girîntirîn şa'êrê edebîyata kurdî ye ku ji aliyê xelkê ji rêzê ve gelek hatîye hezkirin û helbest û berhemên wî keftîne li ser zîmanê xelkî. Çend sebebên vê çendê hene ku xelkî ji wî gelek hez kirîye. Sebebê yekê ji ber sadebûn û safîbûna zîmanê wî ye. Xelk, çavî helbestvanên din ên kurd pitir ji zîman, hizir û derbîrênên wî têdigehiştin û vê çendê zêdebelavbûna helbest û berhemên wî hêsan kirîye. Ji aliyê dî ve Feqî ji bo honandina berhemên xwe yên edebî piştî xwe bi hêmanên folklorîk û serhatîyên di nava xelkî da belav bestîye. Vêca wî çawan hêmanên folklorîk ên di nava xelkê da berbelav kirîye mijara berhemên xwe herwesa xelkî jî li ser wî gelek çîrok, çîrvanok, hîkaye û beyt çêkirine. Mijara vê nivîsarê beyteke gelêrî ye ku li ser hinek serhatîyên Feqiyê Teyran hatîye honandin. Ev beyt ji ber ku ji kombînyoneke helbesta Feqî bi xwe û helbesta gelêrî pêkhatîye ji bo nîşêdana navêkraçûna edebîyata nivîskî û edebîyata devkî nimûneyeke gelek girîng e. Armanca vê nivîsê ji aliyê naverok, rûxsar, şêwe û aliyên cûda ve analîzkirina vê beytê ye.

**Peyvên Sereke:** Beyta Feqiyê Teyran, teyr, Mela 'Ebdilâhê Xwarîkî, Tûma, Ava Mezin.

\* **Dr. Öğr. Üyesi, Zanîngeha Hakkâri, Fakûlteya Îlahîyatê Fakûltesi, Beşa Dîroka Ayınan, Hakkâri, Türkiye./** Dr. Res. Asst., Hakkari University, Faculty of Theology, History of Religions: yasarkaplan111@gmail.com

**ABSTRACT:**

Feqiyê Teyran is one of the most important poets of Kurdish Literature. He is known as a poet loved by the public, whose poems and works were memorized by the people. There are several reasons why people loved him so much. The first of these reasons is, it can be said that easily this is due to the fact that his language is simple and pure. Because the people have understood his language, thoughts and views better than other Kurdish poets and this has been facilitated the further dissemination of his poetry and works. Another reason is he relied on folklore elements and stories among the people in order to compose his literary works. Thus, just as he made the folkloric elements common among the people the subject of his works, the people also created many tales, stories and bayts on him. The subject of this article is an anonymous bayt what build on some stories about Feqiyê Teyran. Since this bayt consist of a combination of Feqiyê Teyran's poetry and folk poetry, it is very important in terms of showing the intertwining of written and oral literature. The purpose of this paper is to analyze this bayt in terms of content, form, style and different aspects.

**Key Words:** Bayt of Feqiyê Teyran, birds, Mollah Abdullah Khwariki, Thomas, Tigris.

**1. DESTPÊK**

Feqiyê Teyran ji ber ku tixûbên di navbera edebîyata nivîskî ya klasîk û edebîyata devkî ya gelêrî bezandine û herdû qad navêkhelkirine, helbestvanekî cuda û xwe-ser e. Ji ber vê taybetîyê, mirov dikare wî wekî 'aîdê herdû qadan helsengîne. Wî, di alîyekî da bi jinûvesazkirina çîrok, serhatî û beytên gelêrî ve berhemên devkî êxistine qalibê nivîs û xwendinê û di alîyê din da jî bi forma hîlbijartî -ku beyt e- û şeweyê xwe ve, şîyaye berhemên nivîskî bi rêka zar(bêjî) û guh(darîyê) ve di nava dil û bîrdanga civakê raçîne. Vê çendê dînamîzîm êxistîye edebîyatê û hem hatinûçûna navbera herdû qadan sanahî kirîye hem jî îmkana jinûvesazkirin û afirandina berhemên edebî yên nû daye. Navêkhelbûna herdû qadên navborî û jinûvesazkirina berhemên edebî taybetî di beyta Feqiyê Teyran a gelêrî ku serhatîya wî û Tûmayê Fileh û dîyaloga wî û Ava Mezin vedihewîne, dîyar dibe. Ev beyt ji bo têgehiştina navêkhelbûna edebîyata nivîskî û ya devkî daneyên muhîm nîşa me dide. Sererayî girîngîya vê mijarê, ev babet wekî hejî nahatîye vekolîn. Lewra me fer dît li ser vê babetê rawestîn.

Beyt, cûreyekî edebîyata kurdî ya devkî ye. Ev cûreyê edebî, vegêrana bi devkî ya hîkaye an jî serhatîyekê ye ku an bi temamî stirankî têtê vegotin an jî ew lêkdanek e ji stirana helbestkî û ji axaftina pexşankî pêkhatî. Beyt, bi karaktera xwe ya hîkayekirinê û dirêjbûna xwe ve ji stiranên lîrîk yên folklorî kurdî û herwesa bi stirîna forma helbestkî ve jî ji çîrok û serhatîyan cuda dibe. Her çend di edebiyata rojhilatê da beyt ji bo biçûktirîn hêmanê helbestê bête bikarînan jî di edebiyata kurdî da cûreyekî cuda û serbixwe ye û çîrok û hîkayeyên menzûm an jî niv menzûm-niv

peşan îfade dike (Hassanpour, 1989; Cîhanî, 2022, r. 19-29; Kaplan, 2020, r. 133-134). Beyt, her çend di binyat da cûreyekî edebîyata kurdî ya devkî be jî di edebiyata kurdî ya klasîk da hinek edîbên kurd jî berhemên xwe bi şiklê vê cûreyê nivîsîne. Rengvedana beytan di edebiyata klasîk a kurdî da tenê bi vê çendê ve nemaye û gelek beytên di nava xelkî da belav ên wekî *Zembîlfiros*, *Hespê Reş* an jî *Memê Alan* ji alîyê hinek edîbên klasîk ve serejinû hatine nivîsîn. Ji ber vê çendê peywendîyeke xurt di navbera edebîyata nivîskî û beytên gelêrî çêbûye (Hassanpour, 1989).

Di edebiyata kurdî da helbestvanê ji hemîyan zêdetir bi nivîsîna beytan ve mijûl bûyî Feqîyê Teyran e. Ew, li dû destxetekê, di beyta xwe ya bi navê *Ey Avê Av* da xwe wekî *Şa'irê beyt û xezelan* dide nasîn (Doskî, 2012, r. 104). Di gelek destxetan da menzûmeyên wî yên dirêj wekî *beyt* an jî *qewl* hatine binavkirin (Aykaç, 2021, r. 28-49). Menzûmeya Feqîyê Teyran, *Ey Avê Av* ku qismen mijara nivîsara me ye, di destxetan da bi rengekî vekirî wekî *Haza beyt Feqîyê Teyran, bi avê ra xeber daye* hatîye danasîn (Koleksiyona Aleksandre Jaba, Klasor No: 19, 20, 27, 45). Feqîyê Teyran çawan bi nivîsîna beytan ve di nava xelkî da hatibe nasîn û hejêkirin herwesa ew bi xwe jî bûye mijara beytên gelêrî. Yanî bi gotineke dî xelkê sade li ser jîyan û serhatîyên Feqe, beytên cuda ava kirine. Lê belê tiştê balkêş ew e ku Feqe, tenê bi serhatîya xwe ve ne, herwesa bi beyta xwe ya bi navê *Ey Avê Avê* ve bûye mijara beyteke gelêrî. Hassanpour dema behsa naveroka beytan dike wekî babeteke serekî ya naveroka beytan îşaretê bi mijarbûna hunera beytê (baladê) û jîyana hozanan jî dide (Hassanpour, 1989). Ev îşareta wî di Beyta Feqîyê Teyran a gelêrî ku mijara nivîsara me ye, tam cihê xwe digire. Di vê beytê da hem hinek serhatîyên Feqe hem jî beyta wî ya bi navê *Ey Avê Av* wekî beyteke cuda û serbixwe ya gelêrî hatîye honandin.

## 2. JÊDERÊ BEYTA FEQÎYÊ TEYRAN

Jêderê Beyta Feqîyê Teyran a mijara nivîsara me, jêderê devkî ye û ji devê melayekî qesîdexwîn ê bi navê Mela 'Ebdullahê Xwarikî (Abdullah Önen) hatîye wergirtin. Ev beyte li ser kaseteke sa'etek û bîst û heşt deqîqe da hatîye qeydkirin û me ev qeyde li ser youtube peyda kirîye (Xwarikî, 2013). Di destpêka qeydê da beytbêj xwe wiha dide nasîn: "Ez Mela 'Ebdullahê Xwarikî ma, ji bo xatirê Mihemed Emînê Kevirzî, bandçî, mala wî Mîdyadê, vê banda ha hedîya jê ra dagirim, Musli-man ji xwe ra jê faydelenmiş bibin." Piştî vê danasînê Mela 'Ebdullah dibêje, Feqîyê Teyran ji bo xwendinê li cem Melayê Cizîrî hinek şî'ran ji wî ra dişîne û Melayê Cizîrî jî şî'ra wî jê ra vedigerîne û Xwarikî dest bi xwendina daneberheva Mela û Feqe dike. Çend bendekan ji vê daneberhevê dixwîne û paşî dibêje çend bend têra qiseta Mela û Feqe nakin û dawî li wê babatê tîne, derbasî qiseta Feqe û Tûma dibe û beyta mijara vê nivîsarê bi dirêjî vedibêje. Bi rastî îcrakerê vê beytê Xwarikî, dema dibêje "Ez ê qesîda wî ji we ra bêjim." (Xwarikî, 2013) vê vegêrana xwe wekî qesîde bi nav

dike û behsa beytê nake. Lê belê qesîde cûrekî edebiyata klasîk a nivîskî ye û ji bo vegêranên gelêrî, di hinek deveran da bête bikarînan jî, di çarçova edebiyata kurdî ya devkî da dirist nîne.

Me, peywendî bi Mihemed Emînê Kevirzî (M. Emin Dağ) kir û derbarê vê qeydê da me hinek agahî jê wergirtin. Li dû agahîya wî dayî, ev qeyde di sala 1983yê li bajarê Îskenderûnê hatîye wergirtin (M. E. Dağ, mullaqat, 27 Nisan 2022). Mela ‘Ebdullah, xelkê Gundê Xwarikê (Topraklı) ye û di sala 1938ê da hatîye dinyayê. Xwarikê gundek e ser bi Hezexa (Îdil) qeza Şirnexê ve û her çend ser bi Hezexê be jî pitir nêzîkî Mîdyadê ye û hatinûçûna niştecihên wî gundî li ser Mîdyadê ye. Mela ‘Ebdullah, di salên 1960an da li Cizîra Botan li medreseya Şêx Seydayê Cizîrî<sup>1</sup> (w. 1967) xwendîye û li wê derê îcazeta medreseyê wergirtîye. Li Hezex û Mîdyadê melatî kirîye. Di sala 1974ê da li Îskenderûnê di Fabrîka “Demîr Çelîk”ê da dest bi xebatê kirîye û paşê li wê derê teqawid bûye. Di sala 2002yê li Îskenderûnê çûye ber dilovanîya Xudê (Cangir, 2014, r. 7).<sup>2</sup> Mela ‘Ebdullah, melayekî qesîdebêj bûye. Dema Şêx M. Nûrullahê kurê Şêx Seydayê Cizîrî di sala 1985an de wefat kirîye li ser wî çend medîhe û mersîye bi awaz xwendine û di kasetekê da tomar kirine (A. Adak, mullaqat, 20 Çirîya Pêşîn 2022). Herweha hinek qeydên wî yên xwendina qesîdeyên Şêx ‘Ela‘eddîn Xiznewî jî hene.

### 3. BEYTA FEQÎYÊ TEYRAN JI ALÎYÊ RUXSARÎ VE

Beyta Feqîyê Teyran a devkî nîv-menzûm û nîv-peşan e. Bi awayekî din qismekî wê bi helbestkî-stirankî û qismekî wê jî bi peşankî têtê vegêran. Qismê helbestkî ji malikên çarrêzî yên bi qafîye pêk têtê û bi selîqe têtê xwendin. Di qismê helbestkî da sed û heşt (108) malik hene. Qismê peşanî bi axaftina asayî têtê hîkayekirin. Mirov dikare vê beytê dabeşî sê beşan bike. Di beşa yekem da serhatîya rêvîngîya Feqe ya ji Zozanan heta Cizîrê û hevalîya wî û Tûmayê Fileh têtê kirin. Di vê beşê da di gel peşanê çil û çar (44) malik hene. Di beşa duyem da behsa vegera Feqe ji Cizîrê bo Zozanan û di rê da dîyaloga di navbera Feqîyê Teyran û Ava Mezin (Dicle) çêbûyî têtê vegêran. Ev beş pîranî bi helbestkî têtê vegotin û ji sih û du (32) malikan pêk têtê. Di beşa dawîyê da behsa şeredîyalog û mucadeleya di navbera Feqe û Ava Mezin da qewimî têtê vegotin û gehîştina Feqe ya bi Zozanan ra diqede. Di vê beşê da jî di gel peşanê sih û du (32) malik hene.

Ji ber ku helbesta bi navê *Ey Avê Av* a Feqîyê Teyran di beşa duyem a vê beyta devkî û gelêrî da têtê gotin, peywendîyeke xurt a vê beyta gelêrî û helbesta klasîk

1 Ji bo zanyarîyên berfireh derheqê Şêx Seydayê Cizîrî da bnr. Abdurrahman Adak, “Seyda, Muhammed Said”, TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/seйда-muhammed-said> (26.12.2022).

2 Piştî me nivîsara xwe qedandî em pê hesîyan ku Ömer Cangir berî me deşîfeya vê qeydê kirîye. Lê belê di xebata wî da beyt nehatîye analîzkirin.

a nivîskî heye. Bi rastî beşa yekem û 44 malikên tê da, di çi jêderên nivîskî da nîne û bi temamî gelêrî ye. Lê belê malikên di beşa duyem da, heman malikên helbesta Feqîyê Teyran in û ev beş ne gelêrî ye. Di vê beşê da şeş (6) malikên helbesta *Îro Werin, Lêzim Werin* jî hene ku di gelek destnivîsan da ev helbest di nava helbesta *Ey Avê Avê* da cih digire. Bi rastî bi dehan destnivîsên helbesta *Ey Avê Avê* hene û di her destnivîsekê da hejmara malikên vê helbestê cuda ne. Destnivîsa ji hemîyan zêdetir malikan vedigire ya Seyda Ehmed Hîlmî Qoxî ye û hejmara malikên wê şêst û şeş in (Qoxî, 2019, r. 300-307). Di çi destnivîsên dî da hejmara malikên vê helbestê ji pênceh (50) malikan nabore (Sadînî, 2013, r. 111-126; Dêreşî, 2011a, r. 61-74; Teyran, 2022, r. 40-46; Kurt, 2022, r. 6-12). Piştî berhema Qoxî çap bûyî, di kitêbên li ser jîyan û berhemên Feqîyê Teyran hatine nivîsîn da, helbesta *Ey Avê Avê* serejinû hatîye redaktekirin û malikên Qoxî yên zêde, lê hatine zêdekirin û hejmara malikên vê helbestê bûne heştê û yek (81) malik (Doskî, 2012, r. 87-106). Lê bi rastî helbesta *Ey Avê Avê* di çi destnivîsan da bi temamî nehatîye û di hemîyan da jî ev helbeste kême. Tenê di destnivîsa Xelîl Muznîb a di sala 1902-1904ê da hatîye îstînsaxkirin da ku sih û heşt (38) malik e, di malika dawîyê da nasnavê Feqîyê Teyran wekî *Mîr Mihê* hatîye nivîsîn. Îhtîmaleke mezin ew jî her *Mîm û Hê* be û bi xeletî bi vî rengî hatibûne nivîsîn Ew malik bi vî şiklî ye:

“*Ey Mîr Mihê qelb û mitalan*  
*Mehbûbê ‘eql û kemalan*  
*Şa‘irê beyt û xezalan*  
*Nasihê nesîhetê”* (Doskî, 2012, r. 104)

Lê belê malikeke wekî vê malike di dawîya helbesta Feqî ya bi navê *Bi Çar Kerîman* da jî hatîye (Sadînî, 2013, r. 138; Dêreşî, 2011a, r. 116). Her çawan be helbesta *Ey Avê Avê* kême û divê serejinû ji ber deqên destnivîs bête tûjandin.

Di beşa dawîyê ya Beyta Feqîyê Teyran da sih û du (32) malik hene û ev malik ji bilî nusxeya Qoxî çi destnivîsên dî da nehatine. Di van sih û du (32) malikan, bîst û neh (29) malik di nusxeya Qoxî da hene û sê (3) malik jî tenê di vê beyta gelêrî da hene. Hejmara malikên beşa duyem û sêyem ên Beyta Feqîyê Teyran a gelêrî şêst û çar (64) malik in û ji vana pênceh û yek malik di nava şêst şeş (66) malikên nusxeya Qoxî da hene. Ji ber vê çendê malikên beşa duyem û sêyem a Beyta Feqîyê Teyran peywendîyek xurt di gel nusxeya Qoxî heye. Bi bawerîya me, nusxeya Qoxî ku ji hemî nusxeyên din ên helbesta *Ey Avê Avê* cudatir e, ji ber Beyta Feqîyê Teyran a gelêrî hatîye wergirtin. Bi xwe Mela ‘Ebdullahê Xwarikî û Mela Ehmed Hîlmî Qoxî ji deverên gelek nêzîkî hev in û wesa dîyar dike ku ev beyta gelêrî jî di wê herêmê da belavtir e.

Dabeşkirina Beyta Feqîyê Teyran a gelêrî bi ser sê beşan da ne tenê ji ber peywendîya taybet a malikên beşa sêyê ya bi nusxeya Qoxî ve ye. Herwesa ji alîyê

rêzerûdan û zîhnîyetê ve jî ji hevdû cuda ne. Beşa yekem bi tamamî gelêrî ye û di çî jêderên nivîskî da nehatîye. Beşa duyem ji helbesta Feqî ya bi navê *Ey Avê Av pêk hatîye* û ev helbest bi dehan nusxeyên cuda yên nivîskî da hatîye parastin. Lê belê beşa sêyem ji bilî deqê devkî tenê di nusxeya Qoxî da heye. Nusxeya Qoxî bala hinek vekoleran jî kêşaye ku ew malikên ji destnivîsên di cuda, ne yên Feqîyê Teyran bin (Dêreşî, 2011b, r. 136; Doskî, 2012, r. 92-93). Heke em, malikên beşa duyem û beşa sêyem bi çavekî cuda berawird bikin em dê bibinin ku ji alîyê zîhnîyet û çawanîya rûdanê ve jî cudahîyên berçav hene. Di beşa duyem da ku helbesta Feqîyê Teyran bi xwe ye, dîyalogeke îrfanî di navbera Feqe û avê da derbaz dibe. Ew av, wekî Ava Mezin (Dicle) nehatîye muşexxeskirin û Feqe derbarê binyat û armanca avê da hinek pirsan dike. Av jî beramberî vê çendê cewaba Feqe dide. Lê belê di beşa sêyem da av, wekî Ava Mezin tête muşexxeskirin û ji dîyalogeke îrfanî zêdetir, Feqe, ji avê dixwaze ku gurgur û mişmişê ji xwe neîne, bêdeng be û ezîyetê nede xelkê. Beramberî vê çendê Ava Mezin vê gotina Feqe qebûl nake û dixwaze Feqe di nava xwe da xeniqîne. Di dawîyê da Feqe û Ava Mezin şerê hevdû dikin û Feqe zora Ava Mezin dibe. Beramberî dîyaloga îrfanî ya beşa duyem, di beşa sêyem da şeredîyalog, şer û lêkdan heye. Ji ber vê çendê beşa duyem û sêyem ji hevdû cuda ne û beşa sêyem gelêrî ye.

### 3.1. Kêş û Serwa

Wekî li jorî hatîye îfadekirin Beyta Feqîyê Teyran ji alîyê teşe ve niv helbestkî û niv pexşankî ye. Di pişka helbestkî an jî menzûm da kêş (wezn) û serwa (qafîye) xwemalî heye. Kêş, sîstema birîtimkirin û hemahengkirina rêzik (rist) û malikan (bendan) e. Bi saya weznê hejmara kîteyên rêzikan hindî hev dibin û eve jî îmkana hemahengbûna malikan pêk tîne. Qafîye jî lihevhatina dengên dawîya her rêzikeke malikê ye. Dubarebûna dangan awazeke taybet ji bo hozanê çêdike û bi harîkarîya kêş û rîtmê ve ahengekê pêk tîne (Nazê, 2012, r. 131, 135). Qismê helbestkî yê Beyta Feqîyê Teyran bi wezna bi kêşe hatiye honandin û hejmara kîteyên rêzîkên her malikekê hindî hev in. Lê belê ji ber ku bi devkî hatîye vegêran, di hinek malikan da kêş hatîye xerabkirin. Malikên vê beyte ji malikên çarrêzî pêk tên û her rêzikek ji 8 kîteyan pêk hatîye.

“Gotê, Tûma dirêj meka= 8 kîte

*Van kitêban min reş meka= 8 kîte*

*Belê pirsan ji min meka= 8 kîte*

*Ez neg’hame sîyasetê”= 8 kîte*

Lê belê wekî jorî jî hatîye îfadekirin di hinek malikan da kêş hatîye xerabkirin.

“Fileh got, ya Feqyê ‘ezîz= 8 kîte

*Min soz bî eger ez û tu carekê di vegeîne zozanê, Warezîz= 22 kîte*

*Ez ê j'bo te çêkim bedlê temîz= 10 kîte*

*Her sal li weqt û adetî"= 8 kîte*

Serwaya qîsmê helbestkî ya Beyta Feqîyê Teyran birêkûpêk e û hema hema malika pêşîyê tê ne, di hemî cihan da ev rêkûpêkiye berdewam dike. Sîstema serwaya malikan wiha ye:

<i>"Gotê Tûma vir da were</i>	a
<i>B'Xudê min j'te ne bawer e</i>	a
<i>Te ne mezheb û defter e</i>	a
<i>Qebûl nakim vê qissetê"</i>	b

Di beytê da serwaya rista çarê ya hemî malikan wekî hev e. Lê belê her çend serwa rêza çarê piranî li ser tîpa (ê) hatibe avakirin jî hinek caran tîpa (î) hatîye bikarînan.

#### 4. BEYTA FEQÎYÊ TEYRAN JI ALÎYÊ NAVEROKÊ VE

##### 4.1. Rêzerûdanên Beytê

Beyta Feqîyê Teyran, behsa hinek serhatîyên Feqîyê Teyran dike. Beytbêj di destpêka beyta xwe da îşaretê bi vê çendê dide û dibêje: "... Çawan ji zozanan hatîya û heya kû dê gerîyaya û çî mûsîbet hatine serê wî ez ê ji we re bandê da bêjim..." Beyt ji rêzerûdanên bi hevdû ve girêdayî pêk tê û em van rêzerûdanan di sê beşan da kom dikin. Rêzerûdanên di beşa yekem da ji serhatîya Feqîyê Teyran û Tûmayê Fileh pêk tê. Feqe bi merema xwendinê, ji Zozanan derdikeve û berê xwe dide Cizîra Botan. Yekî Fileh ê bi navê Tûma jî ji ber ku ji alîyê Mesîhîyan ve hatîye aforoz kirin dixwaze biçe Cizîrê li nik Mîrê Botan û dema pê dihese Feqe dê biçe Cizîrê ji Feqe dixwaze ku wî jî bi xwe ra bibe. Di serî da Feqe naxwaze wî di gel xwe bibe. Lê belê Tûma gelek lava û hêvîyan jê dike û Feqe jî bi şertê ku Tûma xwe têkelî karê wî neke, pirsan jê neke û ji dûr ve wî taqîb bike rêhevalîya Tûma qebûl dike. Di rêwîngîya ber bi jêr da rêhevalîya Feqe û yekî fileh wekî tiştêkî gelek xerîb têtê dîtî û gelek kes dixwazin wan ji hevdû cuda bikin an jî zerere bigehînin Tûma. Belê Feqe li ser soza xwe dimîne û Tûma tenê nahêle, wî ji belayan muhafize dike û bi sax û selametî digehîne menzîlê. Dema herdû heval nêzîkî Cizîrê di bin, di Gelîyê Qesrîkê da bêhna xwe vedidin û li wê derê du teyrik bi hevdû ra diaxivin û di axaftina xwe da dibêjin ku Tûma dê xîyanetê li Feqe bike û ji ber wî, Feqe dê rastî gelek bela û serêşîyan bêt. Tûmayê Fileh ferq dike ku Feqe bi zimanê teyran dizane û di gel wan diaxive. Feqeyê sirra wî îzhar bûyî ji Tûma dixwaze ku ev tiştê dîtî nebêje kesê û Tûma jî soz dide wî ku ew, wê sîrrê aşkera nake. Dema digehin Cizîrê, Feqe diçe mizgeftêkê û Tûma jî diçe seraya Mîrê Botan. Tûma dema dibîne ku Mîrê Botan ew şeş meh e ne li mala xwe ye û li Çemê Westanîyê xezîneyekê digere, di cih da li Feqe xain dibe û diçe dibêje Mîr, ez Feqeyekî dinasim, ew zimanê teyran dizane û ew dikare vê xezîne



derxîne. Mîr ji bo peydakirina Feqe emrên tund derdixîne û piştî lêgerîneke dûr û dirêj Feqe peyda dike. Dema Feqe tînin huzura Mîr, ew dibêje ez Feqeyekî reben im, ez nikarim xezîna te derxînim. Mîr bi rênîşandana Tûma ve gelek zorî û zulmê li Feqe dike û wî diavêje zîndanê. Mîr di zîndanê da jî bi xelat û celatê ve dixwaze Feqe razî bike ku cihê xezînê dîyar bike. Lê belê dîsa Feqe qayîl nabe. Dema ku li Cizîrê rûdanên nexweş di navbera Feqe û Mesîhîyan da derkeftin êdî Feqîyê Teyran mecbur dibe ku daxwaza Mîr bi cih bîne. Feqe ji Mîr dixwaze ku gelek heywanan ser jê bike û zîyafetekê bide teyran. Dema zîyafeta cendekên heywanan ji bo teyran hazir kirin ji her alî ve teyr tîn û goştî dixwin. Beramberî vê qencîya Feqe, têjka teyrekî dibêje ez dê sibê di gel rojhilatine li ser devê xezînê hêkekê bikim. Bi vî rengî teyrek, Feqe ji vê tengavîyê dertîne û xezîne têtê derêxistin. Mîr ji Feqe dixwaze ku pişkeke xezînê ji bo xwe bistîne. Feqe dibêje min tenê hindî giranîya sere Tûma zêr divên. Sere Tûma dibirin û diavêne ber mîzana terazîyê lê belê hindî zêran dikin mîzana beramberî wê, serê Tûma ji erdî bilind nabe. Feqe hinek axê dike mîzana serê Tûma tê da û çengeke zêran jî diavêje mîzana dî da, paşî senga herdû mîzanan hindî hev dibe. Feqe, ji bo xwe çî zêran hilnagire û tenê ew çenga zêran beramberî xwîna kuştina Tûma hildigire da bide malbata Tûma. Paşî ji bo vegerana Zozanan ji Cizîrê derdikeve û ev beşe diqede.

Armanca sereke ya vê beşe wekî ragehandin û dîyarkirina çend hizr û boçûnan dîyar dike. Fikra pêşîyê li ser soz û peyman a xwe man e. Çawan Feqe li ser soza xwe ma û Tûma bi sax û selametî gehande Cizîrê, divê Tûma jî wesa li ser soz û peyman a xwe maba û sirra Feqe îzhar nekiriba û ji bo malê dinyayê soza xwe neşkandiba. Fikra dî ya serekî nîşandana çavbirçîtî û têrnebûna benî Ademî û aqibeta wê ya xerab e. Tûma, wekî mirovekî çavbirçî, hevalhêl û bêwefa têtê tewsîfkirin. Di şexsê Feqe da pûçbûn û betalbûna dinyadarîyê û pêdivîya hevsarkirina daxwazên nefsi têtê dîyarkirin.

Di beşa duyem da ku ji helbesta Feqîyê Teyran hatîye wergirtin, ji rûdan û aksiyonê zêdetir dîyalogeke îrfanî di navbera avê û Feqe da derbaz dibe. Wekî beytbêj bi xwe îfade dike, dema Feqe berê xwe dide Zozanan di rê da rastî Ava Mezin tê û hinek pirsan ji avê dike û cewaba wan dixwaze. Feqe ji avê dipirse; tu ji kî derê têt, tu dê biçî kî derê, tu ji kengî ve dinyayê da çêbûyî, armanca te çî ye, ev çî denge ji nava te tê, wextê nebîyan da tu hebûy an na, wextê Adem pêximberî da tu hebûy an ne, muhibek te heye an ne? Av jî beramberî van pirsan hinek cewaban dide û heybetîmana xwe îfade dike û dibêje heta niha kesê ev pirse ji min nekiribûn.

Di beşa sêyem da rengê dîyalogê diguhere û êdî şer û lêkdan di navbera herdûyan da dest pê dike. Ji pexşana di beşa duyem û sêyem da sebebê vê dîyaloga tund mirov ferq dike. Li dû vegêrana pexşanî dema Feqe pirsan ji avê dike û ji avê dixwaze bêdeng be û avê bi bêedeb û bêheyabûnê ve tawan dike av, ji van gotinên Feqe 'aciz



dibe. Dibêje Feqe, “Tu ne xudan ‘ilm î, tu weke dînekî yî û ji heddê xwe derdikevî û ev pirsên heta niha kesê ji min nekirî, ji min dipirsî. Ma tu ji wan nebîyan û wan welîyan mezintir î?” Feqe ji avê dixwaze hêdî, mend û nerm biherike û xelkî ‘aciz neke. Çunkî Ava Mezin gelek bi deng û pêl diherike û dengê wê heta Çîyayê Şengalê diçe. Lazim e zîkrê Xudê bike belê xwe mezin neke. Li ser vê çendê Ava Mezin, Feqe di nava pêlên xwe werdike û dixwaze wî bixeniqîne. Av, gazî masîyan dike û jê dixwaze Feqe bixwin. Faqe harîkarîyê ji teyran dixwaze û teyr nahêlin masî zererê bigehînin Feqe. Feqe, pêşîya Ava Mezin digire û nahêle ew derbaz bibe. Av, li ser hev dipenge û li ser hev kom dibe. Pêlên pêş û yên paş bi hevdû ra dişewirin ku Feqe bifetîsinin lê belê nikarin vê çendê pêk bînin. Di dawîyê da Ava Mezin gazinda Feqe ji Xudê dike. Xudê dibêje avê lazim e tu pêgirîya emrê Feqe bikey. Hîngê av mezinahîya Feqe qebûl dike û soz dide ku êdî bi deng neherike û bi awayekî nerm û mend di menzîla xwe da biçe. Piştî van rûdanan Feqe digehe gundê xwe û jina Tûma tê cem wî û pirsê mêrê xwe dike. Feqe jî wê ji ya bûyî agahdar dike û heqê xwîna Tûma dide jina wî. Bi vî awayî beyt xelas dibe.

#### 4.2. Lehengên Beytê

**Feqîyê Teyran:** Di beytê da ji bo Feqîyê Teyran navên wekî Feqe, Feqîyê Teyran û Feqe Mihemedê Ertoşî têne bikarînan. Ew, ji bo tehsîlkirina ‘ilmî wekî feqeyekî gerok tete destnîşankirin. Xelkê ku wî dinasin ji wî gelek hez dîkin. Herwesa ew wekî dost û ewlîyayekî Xudê tete danasîn û wekî ji serhatîya wî ya di zîndanê tete têgehiştin bi karê îrşadê ve jî meşxûl dibe. Kerameta wî ya sereke axaftina wî ya di gel heywanat û nebatafî ye. Feqe, taybetî zîmanê teyran dizane û bi wan ra diaxive. Ew wisa tete saloxdan ku gelek caran ji ber hubba Xudê aqil der dide û qesîdan dinivîse û dixwîne.

**Tûmayê Fileh:** Tûma mirovekî Mesîhî ye û li zozanan dijî û karê wî çêkirina şal û şepikan e. Ji ber vî karî li zozanan her kes wî dinase. Ji beytê rasterast nahêt dîyarkirin kanê ew ji kîjan mezhebê Mesîhîyan e. Lê belê ji ber ku li wê derê Nestûrî dijîyan mumkîne ew jî her Mesîhîyekî Nestûrî be. Wisa dîyar e hinek arîşe di navbera wî û Mesîhîyan da hene û ji ber hindê hatîye aforozkirin. Ew, wekî mirovekî çavbirçî û tema’ tete nîşandan.

**Mîrê Botan:** Di beytê da navê wî bi eşkerayî nahêt gotin û hema bi tenê wekî Mîr tete behskirin. Mîrê Botan her çend gelek zor û cefa li Feqîyê Teyran kiribe jî, ew wekî sebebê van xerabîyan nahêt dîtin û hemî kiryarên wî yên xerab bi handana Tûma ve tete girêdan. Mîr, her çend ji bo peydakirina xezîne gelek çavsor be jî, ew wekî mirovekî çavbirçî nahêt saloxdan.

**Ava Mezin:** Yek ji girîngtîrîn lehengê beytê Ava Mezin e. Ava Mezin wekî nav hem ji bo Çemê Dîclê hem jî ji bo Çemê Botan tete bikarînan. Feqîyê Teyran bi Ava Mezin ra diaxive û paşê ew jî cewaba wî dide. Di beşa duyê da dîyalog bi rengê

îrfanî didome. Lê belê di beşa sêyê da ev dîyalog diguhere û di navbera herdûyan da şer û lêkdan çêdibe û di dawîyê da av teslîmî Feqe dibe. Herwesa hêmanên Ava Mezin pêlên pêş û paş û ava bi pêl û ya nerm jî beşdarîya axaftinê dikin.

**Teyr:** Teyr di beytê da hêmaneke serekî ye û wekî dost û piştevanên Feqe tene nîşandan; hem rê nîşa wî didin hem jî wî ji tengîyan derdiêxin. Du teyrik bêyî ku bi berfirehî bêne saloxdan, Feqe ji xaînîya Tûma agahdar dikin û dixwazin wî hişyar bikin. Herwesa têtjikeke teyran, sererayî dayika xwe û padîşahê teyran li ser devê xezînê hêkekê dike û bi vî awayî cihê xezînê nîşa wî dide. Qencîya teyran ya dawîyê jî ewe ku nahêlin masî Feqe bixwin. Di vê beytê da ji bilî axaftina Feqî ya di gel av, masî û teyran, ew bi xwe jî bi hevdû ra diaxivin. Ji bilî van lehengên serekê; muxtarê gundî, gundî, hinek mela û feqî, karker û zelumên mîrî û navmalîyên wî û pîreka Tûma jî cihê xwe di beytê da digirin.

#### 4.3. Cih û Mekan

Di beytê da cihên rêzerûdan tê da qewimî bi awayekî vekirî û rasteqînî tene vegêran. Heta hinek erd bi hûrgilî tene wesifkin. Ji ber vê çendê mirov di beytê da rastî çî cihên xeyalî nahêt. Ji bo welatê Feqîyê Teyran bi giştî navê Zozanê tene bikarînan ku vê gavê jî li Cizîrê ji bo bakûrê Şirnexê heta Gola Wanê û devera Hekarîyan ev nave tene gotin. Lê belê bi hûrgilî li ser devera Zozanê ku meqsed jê Miksê û derdora wê ye, behs nahête kirin. Lê hindî Feqe ber bi jêr ve têt û digehîte Cizîrê, derheqê cihan da agahîyên berfirehtir tene danê. Cihên wekî Gelîyê Qesirkê, Gundê Qesir Dela, Birca Belek û muştemîlata wê, Çemê Westanîyê, Ziyareta Caferû Sadiq, Camîya Sewîqe, Borê Mirîşkan û Rezê Mîr Hesen ên li Cizîrê wesa tene danasîn ku yekî guhdar bi rahatî dişêt li ser topografîya wan serwest bibe.

### 5. ZIMAN Û ŞÊWEYÊ VEGÊRANÊ

Zimanê beytê, kurmancîyeke zerd û zelal û herikbar e. Her çend peyvên ‘erebî û qismen hinek peyvên tirkî tê da hebin jî, ev çende ji bo têtgehîştina xelkî nabin asteng. Ji ber ku beytbêj xelkê devera Torê ye, beyt, taybetîyên devoka Torê vedihewîne (bnr: Kalan, 2019: 56-60; Kalan, 2021, r. 213-242). Ev çende taybetî di pexşana beytê da dîyar e. Pişka helbestkî her çend hinek taybetîyên zimanê Feqe bi xwe, biparêze jî di bilêvkirinê da dîsa xwe dikêşe ser bi devoka Torê ve. Em dikarin vê çendê di xalên jêrî da dîyar bikin:

- Guhorîna tîpa “e” ber bi tîpa “a” ve: Lazim **a** (lazim e), hatîya (hatîye), bika (bike), neka (neke), filhê te **ma** (filhê te me), mezin **a** (mezin e).
- Guhorîna tîpa “î”yê ber bi tîpa “ê” ve: Ê **bênim** (ê bînim).
- Bi tîpa “a” yê ve xilasbûna paşdaçekan: Jê **ra** (re), têt **da** (de).

- Di lêkerên dema niha û dema bê da kêşana kesê yekhejmar ê sêyem da tîpa “e” wekî tîpa “ê” tête kêşan: **Dikê** (dike), ê **bikê** (ê bike).

- Di dema bê da cînavka kesê duyem “tu” dema bi raveya dema bê “dê” ve tête gotin pêkve tête risandin: “**Tê** (tu dê) ‘ilmê xwe tamam bikî”.

Di beytê da çavnêriya beytbêjî bi terzê hakimane ye. Beytbêj, di vegêrana rêzerûdanan, meseleyan, şayesandina derûnî û fizîkî ya lehengan, cih û deman da bi şeweya xasî xwe ve serwextbûna xwe ya beytê dîyar dike. Ew, herwekî di cih û demê rûdan û meseleyan da li wê derê amade ye teswîr dike û tiştê di dil û mejîyê lehengan da derbaz dibe pêşbînî dike. Wekî karekerekî veşartî, bi hizr û boçûnên her lehengekî dihesê û aqîbeta rûdanan texmîn dike. Di beytê da dîyalog cihekî gelek girîng digirin û beytbêj, taybetî di dîyalogan da çavnêriya hakimane bi kar tîne. Peywendîyek xurt di navbera qîsmê helbest û qîsmê pexşan da heye. Piştî xwendina benedê helbestkî, beytbêj bi pexşanî wê bende şerh û rave dike û tiştên ji bo guhdaran veşartî dimînin aşkera dike. Bo nimûne di benda îfadeya “Lê wekî Biraîm û ‘adetê’ derbas dibe, beytbêj vê îfadeya veşartî bi berfirehî aşkera dike û serhatîya Hz. Îbraîm û mêrkê senemperest vedigêre. Ev şewê vegêranê, di qîsmê duyê tê ne, hema hema di hemî cihên mayî da dîyar e.

Beytbêj di vegêrana beytê da hinek cihan anokranîzmê dike. Anokranîzm bi kurtî guhorîna cih û demê kes, tişt û rûdanan a rasteqînî ye. Beytbêj hinek caran lehengên xwe bi peyv û têgehên îroyîn an jî demeke cuda ve dide axaftin. Bo nimûne dema Feqe dixwaze ji Mîr ra bibêje ku ew cihê xezîne nizane, dibêje “Ma ez pîlot im, fen me‘emûrî ma”. Hâlbuki ev peyve di wextê Feqe da nebûn û ne mumkîn e Feqe vana bi kar bîne. Herwesa dema dixwaze ‘acizbûna Mîrî îfade bike, dibêje “Sîgorta serê Mîr avêtîye” û peyva sîgorta ku peyveke nû ye bi kar tîne. Ev rewşê di bikarînan peyvên wekî; “îstop bika”, “yasax” û “muhandis”, da jî berdewam dike. Beytbêj, dema behsê rêvîngîya Feqe ya ji Zozanan heta Cizîrê dike, li dû ‘eşîretên ku vê gavê li wan deveran dijîn, danasîna ‘eşîretên serdemê Feqe dike. Belê gelek ji wan ‘eşîretên ku navê wan tîne di serdemê Feqe da bi wî navî li wan deran nedijîn. Bo nimûne, her çend rast nebe jî, Feqîyê Teyran wekî Feqe Mihemedê Ertoşî bi nav dike. Hâlbuki Ertoşî, vê gavê ji Şaxê (Van/Çatak) heta Elkê (Şîrnak/Beytüşşebap) belav in û Ertoşî xelkê devera Miksê nîne. Herwesa xeta rêvîngîya Feqe jî Miksê ber bi Cizîrê ye û di wî semtî da Ertoşî nîne. Beytbêj behsê babikên Ertoşîyan ên wekî Mamxuran, Jêrkî û Gewdanan dike. Halbûkî di serdemê Feqe da ev ‘eşîretên navborî hêj wekî ‘eşîretên cuda û serbixwe çênebûbûn û hemî bi navê Ertoşîyan dihatin zanîn. Lê belê beytbêj ji hebûna Ertoşîyan a îroyîn ya li wan deveran hereket dike û wan û Feqe diêxe semtekî da. Beytbêj herwesa dema behsê muxtarê gundî û mêvanên wî an jî behsê pereyê Mecîdî dike, dîsa anokranîzmê dike. Çunkî di wî

wextî da ne sazîya muxtarîyê hebû ne jî pereyê Mecîdî hebû. Di beytê mirov dikare rastî hinek nimûneyên din ên anokranîzmê bêt.

Sererayî di hinek cihan da bikarîna anokranîzmê, beytbêj, di gelek cihan da bi awayekî serkeftî şîyaye têgeh, têgehiştin, dîtin û ruha serdemê Feqîyê Teyran veguhêze. Bo nimûne rewşa xeyrî musulman ên di gel civaka kurdî dijîn û zihnîyeta kurdên musliman a li beramberî wan bi şêweyekî resen hatîye veguhastin. Dema behsa silavdana Tûmayê Fileh bo Feqe dike, dibêje “Fileh navroj daye l’sere”. “Navroj xêr kirin” usûlê silavdana kurdên musliman û xeyrî musliman e ku dema bêyî “selamûn ‘eleykûm” ev silav hatiba danê, dihate têgehiştin ku muxatab ne musliman e. Herwesa ji beytê derbarê jîyan û rewşa xeyrî musliman mirov dikare hînî gelek tiştan bibe. Xeyrî muslimên re’aya an jî re’yet bi karên wekî çêkirina şal û şapikan ve meşxûl in û bê hîmayeya kurdekî xudan hêz, neşên bi rehetî rêvîngîyê an jî danûstandina bikin. Lewra Tûma dixwaze bi Feqe ra bigere da ji xerabîya xerabîkeran xalî bibe û bête xudankirin. Lê eve nahêt wê me’nê ku ewan çî heq û huqûq nîne. Dema Tûma dibêje: “Ez filhê te ma. .... Şer’a şerîf barê stûyê te ma” îşaret pê têtê danê ku her Mesîhîyek di hîmaya kê da be divêt ew berevanîyê ji mafê wî bike. Mûcîbî vê çendê dema Feqe vedigere Zozanan hizra heqê xwîna Tûma dike û heqê xwîna wî teslîmî jina wî dike.

## 6. ENCAM

Feqîyê Teyran her çend kesayetîyeke dîrokî be jî, ji bilî vê çendê, ew, di nava xelkê kurd da wekî şexsîyeteke efsanewî têtê zanîn. Peywendîyek xurt di navbera wî û xelkî da heye. Wî, çawan metel, serhatî, çîrok û efsaneyên di nava xelkî kirine mijara berhemên xwe, xelkî jî di teheyula xwe da gelek çîrok, çîrvanok û beyt li ser wî ava kirine. Me, di vê nivîsarê da cih da yek ji beytên li ser Feqîyê Teyran hatiye honandin. Tiştê vê beytê balkêş dike ewe ku Feqîyê Teyran bi beyta xwe ya bi navê *Ey Avê Avê* ve ketîye nava beyteke gelêrî. Di vê beytê da mijarbûna hunera beytê û serhatîyên şa’ir û beynivîsekî, vê beytê ji beytên din cuda dike. Taybetîyên edebîyata klasîk û edebîyata devkî di heman beytê da dîyar dibin û ev çende pirekê di navbera herdu qadan da ava dike.

Ev beyt ji aliyê Mela ‘Ebdullahê Xwarikî ve hatîye vegêran û paşî hatîye tomar-kirin. Qismekî wê bi helbestkî û qismekî wê jî bi peşanî hatîye vegotin. Qismê helbestkî ji 108 malikan pêk tê ku 44 malikên pêşîyê tenê di vê beytê da hene. Malikên mayî jî nîvek ji wan malikên helbesta Feqîyê Teyran a bi navê *Ey Avê Avê* ye û nîva dî jî tenê di nusxeya Qoxî da peyda dibin. Ji ber ku nusxeya Qoxî ji hemî nusxeyên din ên helbesta *Ey Avê Avê* cudatir e, em wesa hizir dikin ku Qoxî, nusxeya xwe ji ber deqê gelêrî wergirtîye. Ji ber vê çendê em, nusxeya Qoxî her wekî verêja vê beyta gelêrî dibînin.

Beyta Feqîyê Teyran ji sê helqeyên serekî yê rêzerûdanan pêk tê û di her helqeyê da ji bilî Feqîyê Teyran lehengên dî diguherin. Lê belê ev çende yekparêzîya temamê beytê xerab nake û peywendîyên helqe û rêzerûdanan bi awayekî rêkûpêk, bê arîşe dewam dike. Di helqeya pêşîyê da ji bilî Feqîyê Teyran lehengê sereke Tûmayê Fileh e. Di helqeyên dawîyê da cihê Tûma, Ava Mezin digire. Lê belê di dawîya beytê da bi jina Tûma ve dîsa peywendîya lehengan tete sazkin.

Zimanê beytê, sererayî hinek peyvên ‘erebî û tirkî, kurmancîyeke rehwan û sivik e. Beytbêj xelkê devera Torê ye û di beytê da hemî taybetîyên vê devokê xuya dibin. Lê belê taybetî di qismê helbestkî yê beytê da mirov rastî zimanê helbestên Feqîyê Teyran tê. Beytbêjî, di vegêrana beytê da çavnêriya hakimane bi kar îname. Piştî xwendina bendên helbestkî, bi pexşanî şerh û raveya wan hatîye kirin û tiştên ji bo guhdaran veşartî dimînin hatine aşkera kirin.

Di vegêrana beytê da gelek cihan anokranîzm hatîye kirinê. Beytbêj, di hinek cihan da bi peyv û têgehên îroyîn ve lehengên beytê dide axaftin. Herwesa ji bo tewsîfkirin an danasîna hinek ‘eşîretan, hinek rûdan û rewşan jî agahîyên îroyîn hatine bikarînan. Lê belê ev çende nabûye asteng ku têgeh, têgehiştin, zîhnîyet û ruha serdemê beytê bi awayekî serkeftî nehête raçavkirin.

## 7. ÇAVKANÎ

Adak, Abdurrahman, “Seyda, Muhammed Said”, TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/seйда-muhammed-said> (26.12.2022).

Aykaç, Y. (2021). *Danasîn û Tewsîfa mecmû’eyên helbestan di koleksiyona Aleksandre Jaba de*. Kurdiyat, (4), 23-60.

Cangir, Ö. (2014). *Feqîyê Teyran û Tûma*, Ankara: Lîs Yayınları.

Cîhanî, P. (2022). *Mem û Zîn*, Van: Weşanxana Peywend.

Dêreşî, S. (2011a). *Dîwana Feqîyê Teyran*, Ankara: Lîs Yayınları.

Dêreşî, S. (2011b). *Bermayêt dîwana Feqîyê Teyran*, Dihok: Zankoya Dihokê.

Doskî, T. Î. (2012). *Feqîyê Teyran û Şî’ra Hey Av û Av*. M. X. Sadîni (Dü.) *Feqîyê Teyran, rêya evînê/muhabbet yolu* (87-107), Van: Van Valiliği Yayınları.

Hassanpour, A. (1989). *Bayt*. *Encyclopedia Iranica*, (Erişim: 02 05, 2022), <https://www.iranicaonline.org/articles/bayt-folk-art> adresinden alındı.

Kalan, L. (2019). *Rêjeyên dangan di devoka Torê/Tûr Abdîn de*, Nûbihar, 147, 56-60.

Kalan, L. (2021). *Dem di devoka Torê da*, Folklor û Ziman, 2(2), 213-242.

Kaplan, Y. (2020). *Di Edebîyata Kurmancî ya Gelêrî da Beyt û Taybetîyên Wê*, Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, 8(UMS’20), 133-136.  
DOI: 10.18506/anemon.832171

Koleksiyona Aleksandre Jaba, Klasor No: 19, 20, 27, 45.

- Kurt, Ş. (2022). *Danasîna Nusxeyên Destxet ên Berhemên Feqîyê Teyran ên Koleksiyona Alexander Jaba*, *Kurdîname* o(7), 6-12. DOI: 10.55106/kurdiname.1169260.
- Nazê, B. (2012). *Ferhenga têrmên wêjeyî*. Dihok: Çapxana Hawar.
- Qoxî, E. H. (2019). *Dîwana camî*, Diyarbakır: Seyda Yayınları.
- Sadînî, X. (2013). *Feqîyê Teyran, Jîyan, Berhem û Belbestên Wî*, İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Teyran, F. (2022). *Dîwan*. (K. Yıldırım, Çev.) Ankara: T:C: Kültür ve Turizm Bakanlığı.
- Xwarikî, M. E. (2013). *Feqîyê Teyran*.(Erişim: 15.04.2022), <https://youtu.be/tn-SNaJEggw>.

### **Mulaqat:**

- A. Adak, mulaqat, 20 Çirîya Pêşîn 2022.
- M. E. Dağ, mulaqat, 27 Nîsan 2022.

### **Extended Abstract**

Feqe Mohammed Muksi, known as Feqîyê Teyran, that is, “The Student of the Birds”, is one of the most interesting and crucial poets of Kurdish literature. This poet lived in the 16th century and he had an important place among the Kurdish people compared to other Kurdish poets. Feqe, besides being a historical figure, he became a legendary figure among the Kurds. In this study deals with a long bayt or narrative song said about Feqîyê Teyran among the people. What makes this bayt or ballad interesting for us is that it deals with the art of balladry and the life of the bard himself. This bayt was recorded orally in 1983 by a performer named Mollah Abdullah Khwariki. This narrative consists of a combination sung verse and spoken prose in terms of form. The part transferred in verse consists of 108 stanzas. Poetry stanzas rhyme and have a certain syllable measure. However, it should be noted that the syllable measure is become deformed in some cases. It is possible to deal with part of the narrative song in three parts depending on the plot of the bayt. The first 44 stanzas of these are original and are not mentioned in any other source. The next 32 stanzas are quoted from Feqîyê Teyran’s famous long poem called “Ey Avê Av”. This poem extant to the present day through many different manuscripts. The last 32 stanzas are included in Feqîyê Teyran’s poem “Ey Avê Av” only in a copy belonging to the compiler named Qoxi. The poem “Ey Avê Av” in Qoxi’s copy has a different identity from all other copies. In fact, many researchers think that this text of Qoxi is not based on Feqîyê Teyran’s poetry himself and that it was compiled from oral tradition. In this respect, there is a close relationship between the last 64

stanzas of the bayt and the text of Qoxi's poem "Ey Avê Av". In our opinion, both are based on oral tradition, unlike other texts.

When this bayt about Feqiyê Teyran is considered in terms of content, it is understood that it is constructed on three intertwined main series of events. In the first part, the story of Feqiyê Teyran and Christian Thomas (Tûma) accompanying her are told, who set off from Zozan (Muks) region to Jezire of Bohtan. Thomas is ostracized by his Christian community and decides to travel with Feqiyê Teyran for a new life. During the journey, Thomas witnesses Feqiyê Teyran's ability to talk to birds and plants. When the two friends' approach Jezire, Feqiyê Teyran asks her not to share this information with anyone. However, after they separate from each other, Thomas reveals his talent to the Ameer of Bohtan, who has been after a treasure for a long time. The Ameer of Bohtan, using Feqiyê Teyran's ability to talk to birds, puts all kinds of pressures on him to find the treasure. Feqiyê Teyran, who couldn't stand all these tortures, showed the place of treasure to the Ameer with the help of birds in exchange for gold the weight of Thomas' head. The second part of the narrative consists of after the murder of Thomas, Feqiyê Teyran's departure from Jezire and his mystical dialogue with the Tigris River while returning to his hometown along the Tigris River. In this section, it is transmitted Feqiyê Teyran's own poem named "Ey Avê Av". In the last part, the mystical dialogue between Feqiyê Teyran and the Tigris River leaves its place to fighting and struggle. Feqiyê Teyran asks the Tigris River to stop flowing proudly and viciously. On the other hand, the Tigris River tries to kill him by swallowing and feed him to the fish. Seeing Feqiyê Teyran in this difficult situation, the birds call out to the fish and prevent them from eating Feqiyê Teyran. He gets rid of the testily waves of the Tigris River and prevents it from flowing downstream by passing in front of the river like a dam. Although the river water which piled up wants to flow, Feqiyê Teyran isn't allow it. Thereupon, the Tigris River gets rid of Feqiyê Teyran by promising that it will flow silently and calmly. According to the narrative, the Tigris River started to flow silently and calmly after this moment.

Although narrative contains some Arabic and Turkish words, its language is quite plain and pure Kurdish. Since the performer is from Tur Abdin region, the narrative shows the dialect characteristics of this region. However, it should be noted that Feqiyê Teyran's poetic language is preserved, especially in the verse. The performer performs to third person omniscient narrator point of view. He is aware of the inner world of the heroes of the narrative and can predict the consequences of the event. After the stanzas of poetry are read, they are annotated and the ambiguous parts are explained to the listener in detail. It should also be noted that in many parts of the narrative anocranism is used. The performer sometimes makes the heroes of the narrative talk with today's perceptions and concepts. However, it must be acknowledged that the Feqiyê Teyran period was successful in conveying its world to the present.



## PÊVEK: DEŞÎFRASYONA BEYTA FEQÎYÊ TEYRAN

### Beşa Yekem

Feqehek hebû ji zozanan, navê wî Feqe Mihemedê Ertoşî bû. Tehsîla 'ilmî dikir û dinyayê digeriha. Ez ê qesîda wî ji we ra bêjim. Çawan ji zozanan hatîya û heya kû dê gerîyaya û çî mûsîbet hatine serê wî ez ê ji we ra bandê da bêjim. Ev Feqê hêna çawan ji zozanan derket, yekî Fileh jî hebû di zozanan da şal û şapik çêdikirin. Meselek hate serê ê Fileh jî, ez ê niha di nav qesîdê da ji we ra bejim, ê Fileh jî hermono [aforoz] bûye ji zozanan, ew jî rasta Feqe tê, gazî Feqe dikê, "Feqe, tu b'Xudê û pêximber kî li hêvya min bawîqî, ez jî bi te ra bêm ka tê ku da herî."

*Feqe ji zozanan dere  
Fileh navroj daye l'sere  
Min te, te b'pêximber e  
Feqe min bistîne b'xwe ra*

*Wê mîr ji te pir hez bikê  
Cihê te camîyê bikê  
Tewsîya te melê bikê  
Tê 'ilmê xwe tamam bikî*

*Feqe gotê, Tûma ne lazim a  
Meqseda min ne mîr û ne hakim a  
Mêrkê qenc bê j'xwe 'alim a  
Çi hewce ye sîyasetê*

Feqe got, "Tûma sîyasetê bi min neka, ez ne hewceyî ne mîrê te ne hakimê te ma." Fileh got, "Xwedê îş xerab bû, lazim ez qena'eteke wî rûnênim heta ku min bi xwe ra bibê".

*Fileh got, ez filhê te ma  
Yolcû û yoldaşê te ma  
Şer'a şerîf barê stûyê te ma*

*Divê tu b'kî vê xizmetê*

Tûma got, "Ezbenî bi şerî'et ez barê stûyê te ma, xwe vir da, wê da neka. Roja qiyametê hinek min bikujin, di mehke-ma kubra da ez ê bêm, ya rebbî vî feqîyî ez ji xwe ra neanîm."

*Gotê; Tûma dirêj meka  
Van kitêban min reş meka  
Belê pirsan ji min meka  
Ez neg'hame sîyasetê*

*Fileh got, emrê Xuda pir mezin a  
Feqe ne muhtacê min a  
Ez j'Feqe re bêjim hinhina  
Feqe muhtac e l'axretê*

Fileh got, "Xudê ez qiseta babê xwe jê ra nebêjim ev Feqa razî nabê. Îcar ez ê qiseta babê xwe jê ra bêjim, belkî bêjê ev filehê hana ê Musilman bibî, belkî min bi xwe ra bibê. Nexwe başçe çare tûna."

*Busilmana babê min ê serjêkirî  
Serê wî tûr û têrê kirî  
Li ava Bota da rêkirî  
Min negot hey vê qibhetê*

*Sa'et li çarî rojê hebû  
Nan û dewê şor-tal li ber me bû  
Ez l'ser taştîya xwe ranebûm  
Min negot wey vê ezyetê*

"Babê min kuştin û ser jê kirin, ji xwe min negot çima hun wer jî dikin. Ez ser taştîya xwe jî nerabûm."

*Piştire filhan li min loma kirin  
Şikayeta min cem keşîş kirin  
Keşîş ez irsîyeta malê babê min  
meni' kirim  
Teb'îd kirim j'vî milletî*

“Îcar filehan şîkayeta min cem qaşo kir û qaşo jî li Încîlê meyîzand got, “ev filehê han ne ji babê xwe ye, weraseta babê wî pê re tuna. Ji ava Musilmana ya, lawê Musilmana ya, lazim a li zozanan da nemînê.” Îcar ezbenî ez î gihama te, lazim a îcar tu min bi xwe ra bibê.”

*Gotê; Tûma vir da wera  
B’Xudê min j’te ne bawer a  
Te ne mezheb û defter a  
Qebûl nakim vê qissetê*

Got, “Fileh were, tu dibêjî keennehû belkî ez musulman bim, walla ez ji te yeqîn nakim. De ka were feqet deh metran pey min da be. Ji îşê min jî qariş neba, ez çî bikim çî nekim qarişî îşê min neba. Wextê tu qarişî îşê min bibê ez ê mala te xerab bikim.” Got, “Ne ezbenî, hema destê te li ser min bê, sitara te li ser min bê, te bivê bîst metran ez dê pey te da bêm.” Got, “De were.” Îcar bi rê ketin, zozanê jorî ku heta bi zozanê jêrî da hatin, nav Mamxurana, Gewdanana, Jêrikî na, Batûşî na, Esidî na, Spêrtî na, Dudêran a, ev timam ‘eşîr ‘eşîr di nav wan ra xwe berdine xwar. Heta hatin mala Muxtar jî, li gundkî bûne mêvan, daîman rîya Feqe di mala Muxtar re ye. Hatin mala Muxtar bûne mêvan, Muxtar jî musafirê wî hene, axa û beg û eşraf rûniştîne. Goştê wan hûr dikê, hazirîya wan dikê. Tûma jî pey Feqe da ye, Feqe da devê dêrî. Wextê da devê dêrî keyfa Muxtar hat, got, “Ehlen we sehlen Feqe Mihemed, ev saleke pêjna te nedihat, xêr û selamet, dê here oda banî mêvan rûniştine, ez ê niha zadekî ji we ra bênim.” Got, “Belê”. Feqe çû banî, men’a wî û Tûma ji hev bû, Tûma ma li

devê derî. Muxtar got, “Tûma”, Tûma nas dikê, şal û şapikan çêdikê, zozanan da herkes wî nas dikê, gotê, “Derdê te çî ye, te xêr e?” Got, “Wallah, ez hevalê Feqe ma.” Got, “Tu file yî, Feqîyê me Musilman, çî îşê te Feqe ra heye?” Got, “Hebik îşê me heye ez pê ra digerihiim.”

*Feqe w Fileh rêbar kirî  
Hatîna gundkî, mala Muxtar musafirî  
Mala Muxtar tijî ma’mûr û amirî  
Feqe rûnişt nav cim’etê*

*Muxtar gotê; Tûma rûna  
Cihê te odê de nîna  
Ha ha betin firavîna  
Rûna li ‘urf û adetî*

Muxtar got, “Tûma rûna li ser vî kurtanê kerê, devê derî da rûna, cihê te oda li banî tuna. Beg û eşref û ma’mûr û xoce timam rûniştî ne, tu nikarî herî nav wan.” Îcar bû mêvanê Muxtar devê derî da ma, bû gavanê mirîşk û tûtika, dora wî hatina hevdû. Feqe meyîzand men’a wî û filhê wî ji hev bû, pîlan ji Muxtar lê ket. Feqe gazî Muxtar kir.

*Feqe go; wa Muxtarê te serserî  
Te çira Filhê min hişte l’ber derî  
Te d’vê em j’mala te herîn  
Qebûl nakî j’me r’xizmetê*

*Muxtar gotê; ezbenî emir bika  
Weke hespan min bar bika  
Li vî kendalî min kar bika  
Ez qebûl dikim j’te re’yetê*

*Feqe gotê; Muxtar!  
Filhê min birçî ye têt bika  
Cihê wî oda jor bika  
Mifta odê teslîm bika  
Da qet nebînît ezyetê*

Feqe got, “Muxtar, wextê tu qîmetê min digirî, ê filehê min jî bigire. Îcar cihê filehê min qarşê min da oda jorî bika, ber û mehfûran bidîyê da û miftê jî derîyê wî mifte ka, ser derî ra bavêje jê ra, da qena’eta dilê wî rûnê ku Musilman min nakujin. Walla tu vê nekî ez ê ji mala te derkevim.” Got, “Belê ezbenî.” Îcar Muxtar wextê wer gazî Tûma kir, bi ‘eksê ve gazî dikir, hem te’nê didê Feqa.

*Muxtar ban kirî; wa Fila  
Va j’te ra mehfûr û bera  
Wer vê oda muqabila  
Lê sebra Feqa gelek te tê*

*Muxtar ban kirî wa Feqa  
Ev şuxlê tu d’kî bê heqa  
Wallah Tûma, Filhê te, kafirek mutleqa  
Lê bêhna kufre j’Filhê te tê*

Îcar wextê ev te’na ha jî Muxtar da Feqa, Feqa bêhtir ‘aciz bû. Îcar hisan go, “Hilon em rabin herin mala Muxtar saloxan filehekê di wir de ye, em wî bikujin.” Hatin dora mala Muxtar qalib dan, sîlahê xwe anîn, tifengê çaplî, reşokê şeşxanan anîn, dora mala Muxtar ketin. Gotin, “Muxtar, ka wî Filehî ji me ra derxe.” Muxtar got, “Heyran her kesek herin mala xwe, ji êvarî ve ez û Feqe Mihemedê Ertoşî bi hev ra mane, Xudê qebûl nakî. Yan dibe pêşî hun ê feqîyê xwe bikujin, dûv ra wî bikujin. Her keskî daxilmîş bibin. Îcar Feqe te’na Muxtar cewab lê vegerand.

*Feqe hêdî hêdî d’kenî  
Muxtar gotê, wey ezbenî qey tu d’kenî  
Feqe gotê; wa Muxtarî, te rûreşî dîsa  
b’tenî  
Qatî aqlê min wek te tê*

*Ez zanîm Tûma kafîr e  
Gurek pîr bê ujdantîr e  
Ji marê teyar zalimtir e  
Lê wekî Bîrahîm û ‘adetê*

Feqe got, “Muxtar”, go, “Belê” go, “Ma na ez ji te çêtir dizanim, hey rûreşê rû b’tenî, aqilsiz. Qatî aqlê min wekê yê te tê. Ez dizanim walla Tûma kafirek mutleq kafîr a. Ji van gurê pîr jî, veca tiştek nakevê destê wan, îxtîyar in, dikevine kevanîyê li tehta da, xwe vedişêrin, vêca heywanê dikevê nav lepê wan, vêca ji wan jî bê uşdantîr a. Van tîremarê han jî ku xelk dibêjin weke teyara difirin ji wan jî zalimtir a. Lê feqet wek babê me Îbrahîm Xelîl ku şexsê kafîr li mala wî bû mêvan, jê sual kir xwarina wî danî ber, gotê, ‘Tu çi millet î, tu çi dikê, tu dê herî kû dê.’ Got, ‘Walla ez kafîr im, ez îbadetê senemparêza dikim, ez senemparêz im.’ Piştî xwe dayê da pê nexweş hat. Ê senemparêz jî got, ‘Wextê dilê wî ji min nexweş a, walla ez xwarina wî jî naxwim.’ Xwarin jî nexwar rabû derket, xatir jî pê nexwest. Sa’etekê ji mala wî dûr ket, Xudayê ‘alemê emrî Cibraîlî kir, wehî anî ji Îbrahîm Xelîl ra, got, ‘Eger tu neçî dilê mêvanê xwe xweş nekî, îbadeta te beyhûde min avê da berda.’ Îbrahîm Xelîl qonaxa sa’etekê, wê îxtîyarîya xwe pey şexsê senemparêz da çûye, gotîye, ‘Mêvanê min, mêvanê min.’ Hîsa wî dikê jî lê navegerê. Heta pêşîya wî wergerêhaya, gotîyê, ‘Qusûra min ‘efû bika, min xwe ji bîr kir hîngê, te zadek li mala min nexwar tu çûyî.’ Gotê, ‘Walla ez nahê mî mala te.’ ‘Çawan tu nahêy, were zadekî bixwe, tu birçî çawan çûy ji mala

min.’ Got, ‘Xudê eger tu min nehilgirî ez nahêm mala te.’ Rabûye gotîyê, ‘Were pišta min.’ Wê îxtîyarîya xwe li pišta xwe kirîye, sa’etekê hilgirtîya, anîye mala xwe da danîya, heta xwarina wî xwarîya, heta Xudayê ‘alemê lê hafîya rehmê. De îcar ew pêximberê Xuda bû wiha kirîya, îcar Fileh Tûma bi lingê xwe tê, ez jî bi lingê xwe têm. Min Tûma nehilgirtîya tu vê te’na ha didîyê min.”

Muxtar got, “Ezbenî, ez dê sualekê ji te bikim, ez ê ricakê ji te bikim.” Got, “Kerem ke, bêje.” Got, “Hema ev filehê hana bûye zelqa min. Min soz bî ez sed mêrê bi çek û sîlah bidimê heta Cizîra Botan. Yeter ki bila ne bi te re bê. Da hema kes nebêje hema filehek û feqehekî Musilmanan bi hev ra digerin.” Got, “Ez dê biçim bêjime Tûma, eger qebûl bikê, bila ser çavan. Wallah sed zalamê çek û sîlah ji min çêtir a jê ra.” Feqe jî çûye devê derî dil lê nakê, diçê camê didê keennehû da camê ra meyzênê da netirsê ku şîklê wî bibinê da nebêje wallah hinekê dê min bikujin. Camê teqteq lê didê, me’lûm e fileh jî nivêjê nakê rojê qamekê avêtîye, Fileh mêyzand got, “Xêr e ezbenî.” Gotê, “Rabe meseleke ha heye, Muxtar vê dibêjê.” Go, “Ezbenî, Xudê heçî hun Musilman in, hun bê ujdin in. Xudê, ser çekê min, ser cilkê min hun ê min bibine wê newala ha da hun ê min bikujin. Roja qiyametê mehkema kubra da ez ê bejim ya rebbî ev feqehê hana ez dame musulmana, ez kuştim. Hîç xilasbûna te tuna heta tu min nebî Cizîra Botan.” Feqe, got, “Muxtar, ez qebûl nakim û xatirê ta.” Muxtar got, “Eman zeman Feqa,

kerem ka.” Feqe, go, “Xatirê ta.” Îcar bi rê ketin heta hatine Gelîkê Qesrikê, deh metran Feqe li pêşîya Filehî. Hatin Gelîyê Qesrikê, newaleke kûr e, qarişê Cizîrê de ya, neqeba Cizîrê û Şernex de ya. Di wî Gelîyê Qesrikê de teyrik ji Feqe re diştexilin, Feqe wê cewaba teyran didê, Tûma jî wê li wan hisênê. Îcar hê nû bû Feqhê Teyran, heta hîngê Feqe Mihemedê Ertoşî bû.

*Feqe w Fileh hatin gelî*

*Du teyrik j’ber wan da d’firîn*

*Yekê got û ya dî d’girî*

*Feqe poşman e b’xizmetê*

Teyrikek girî ya dî got, “Tu çi ra digîrî?” Got, “Gîryê min ser vî feqeyî tê. Feqî dê sonê de poşman bî ku vê xizmetê di vî berazî ra dikê.” Feqe, gotê, “Ez ê çawan poşman bim?” Gotê, “Heta roja bi ser te tê.”

*Feqe b’şer’a şerîf dikê*

*Tûma kengî vê ferq dikê*

*Deryê varan? feqe teng bikê*

*Feqe, bènî helaketê*

Fileh, got, “Ezbenî ewan teyrikan çi ji te ra got, te çi cewaba wan da?” Gotê, “Aleqatê te pê ra tûne, nê min gotîye ta qarişê îşê min neba.”

*Fileh got; ya Feqyê ‘ezîz*

*Min soz bî eger ez û tu carekê dî vegeerîne zozanê Warezîz*

*Ez ê j’bo te çêkim bedlê temîz*

*Her sal li weqt û adetî*

*Feqe gotê; ez ne hewce ma*

*Ne muştaqê bedlê te ma*

*Ellah tine j’min ra xem a*

*Qebûl nakim j’kes minnetê*

Feqe, got, “Fileh, tu nikarî aqlê min kandirmîş bikî. Binêr ku ji devê te derkevê ku tu bêjî ev Feqehê hana û teyr bi hev ra diştexilîn, ez ê mala ta xerab bikim. Feqet ev teyrê hana dibêjin Tûma ê lê xaîn bî, îcar wer dibêjin.” Gotê, “Ezbenî teyr derewan dikan, ev qencîya ku te ji min ra kirîye ez ê çawan li te xaîn bibim.” Got, “Wer dibêjin.” Qesir Dela heyê di qarişê Cizîrê da serê kopriyê de ya. Serê kopriya ku Mîrê Botan çêkirî, gundik e wêdê. Mela Resûl, melayê Qesir Dela ya. Yekî dehîya xwe ser jê kirîya, kezêb û ser û pê dane feqeha. Gazî kirin, “Walla va Feqe Mihemedê Ertoşî hat.” Mela Resûl hate pêşîya wî selamûn gotin heta gehanê. Gotin, “Feqe me bêriya te kirîya, de ka îşev cem me be, êvara îne ya, em ê ji xwe ra suhbetê bikin.” Got, “Belê.” Got, “Evê ha pey te da kî ya?” Got, “Wallah filehek e zozanan min ra hatîya.” Got, “Bişqemere here Cizîrê, çi ‘elaqê te Feqa heya.” Feqe, got, “Seydayê Mela Resûl, dilê Filehê min nehêle, de bi xatirê te.” “Eman û zeman Feqe Mihemed, kerem ke îşev cem me be.” Got, “Xatirê te.” Hatne ber Birca Belek, Feqe, got, “Tûma”, got, “Ha”, got, “Îcar ev Birca Belek e, va birca Mîrê Bota ya. Tu here bircê derdê xwe ji Mîr ra beje, ez jî herim camîkê ji xwe ra bixwînim, tehsîla ilmî bikim.” Got, “Fileh, eger tu ji hinekan ra bêjî feqehê halo hate Cizîrê, ez ê mala te xerab bikim.” Got, “Na ezbenî, ne te ez dîtîm ne min tu dîtî.”

*Belê fileh vir da were  
Dev j'min berde j'min bigere  
Min j'Mîr re neke mesder e  
Feqe êdî hew kêr te tê*

*Çaxê Feqe û Fileh j'hev qetîyan  
Fileh got j'kulê van teyra, van Botîya  
Bo virgotina teyran, van tûtîya  
Ez de'wedat im qîyametê*

*Feqe got; Fileh helbet eserek tê heyê  
Lê xaibê j'qelbê me ye  
Gotna teyran bêşubhe ye  
Heta roja bi ser me tê*

*Fileh hate bircê bi seyr  
Çar kenar nêrî, maye heyr  
Got navroja hewe bi xeyr  
Ka xwedîyê vê sultanetê*

Wextê fileh hate bircê meyîzand birceke vala, qet kes tê tuna. Pîrek, îxtîyar, cêriyên wî tê de na. Hayê wan ji tiştêkî tuna. Got, “Rojê we bi xêr.” Got, “Xêr û silamet.” Got, “Ka sultanê vê bircê, ka mîrê vê bircê, ka hakimê vê bircê.” Got, “Tu ji kû yî.” Got, “Ez ji Zozana ma, navê min Tûma ye. Min xwe deryê Xuda û deryê Mîr girtîya. Mûsibetek hatîya serê min.” Got, “Ma tu tiştêkî nehesayay.” Gotê, “Na.” “Hey mala te xirab bî” gotê “heçî Mîrê Bota ye ev şeş heyîve mala xwe nedîtîya.” Got, “Çi lê qewimîye?” Got, “Di vî Çemê Westanîyê da çadîreka xwe vedayî, ruha wî û sûretê wî, hatîye kaba wî. Remildara tarîx jê ra gotine, gotîye xezînekî vî çemî da ye, bihayê çil barê deveha zêr tê de heyê. Wî dîyarî diqulipînê ser vî dîyarî, vî dîyarî diqulipînê ser wî dîyarî. Pênsed ‘emelle girtîya her rojê heya êvarê her yekî me’aşê wan didê wan. Va şeş mehe lê didê û tiştêk nedî. Û xezîna xwe jî da heqê emela û dîn bûye, aqil kaçirmîş kirîye. Sîgorta serê Mîr avêtîye.” Fileh

di cih de li Feqe xaîn bû. Got, “Min bi-  
bine huzûra Mîr, ez ê xezîne derînim.”  
Yekî got, “Ka were ez ê te bibim.” Wextê  
bir, qarişê Mîr ket, îcar Fileh ji Mîr re  
hîkayeta Feqeh got.

*Fileh go; ya Mîr, ya ez xulam  
Feqhek min dîteyevtemam  
Nîne wek wî di Misr û Şam  
Ji wî bixwaza me’rîfetê*

Gotê, “Mîrê min, wallah feqehêk bi  
min ra hate vî bajarî di Misr û Şamê de jî  
ewlîyayê weke wî mezin tune. Muheqeq  
isme ‘e’zem jî zanê. Heta heywanetê beh-  
ra heta kevoka heta kulîlka heta teyrika  
heta kurmika heta dara heta axê heta  
kevir û gîya pê ra diştexilî, cewaba wan  
dida. Bi rê da ez pê ra bûm. Ew feqe jî  
hate vî bajarî. Hema gazî wî feqî bike dê  
ji te ra xezîne derîne. Ne hewce ye tu xwe  
‘aciz bikî. Feqet feqekekî werê ye pilancî  
weke wî nînin, aqildar weke wî tuna. Dê  
bi aqil te wirênî. Bê, îmkan nîne lazim e  
tu xezîna min derîni. Feqet ku bizanibe  
ku min gotîye ji te ra, dê cih de mala min  
xerab bikê. Ez hêvî û ricayê ji Mîr dikim,  
tu min veşêrî çadirê da. Tu gazî feqehan  
bikî, muheqeq ka çend feqe di Cizîrê de  
ye nav wan da ye. Îcar ez nizamim şiklê  
wî, qama wî bejim.” Feqe pir in, sê sed  
û şêst û şeş camî di Cizîrê de bûn. Her  
yekî ka sed feqe tê de ye ka pêncî feqe  
tê de ye.

*Lê belê mîrim Feqa ezîz bika  
Qewî .....  
Xezîne pê ra nîvî bika  
Da hel biket meslîhetê*

*Feqe qencek cihê xwe da  
Îlerîyê d’weqtê xwe da  
Bikê, nekê, tu berneda  
Çiqa bavê şerî’etê*

Gotê, “Mîrê min, çiqavavê şerî’etê,  
‘bê, ‘ez nizamim mîrê min, ma ez feqîrê  
Xudê’, hîç wî neberde. Tu wî berdî çû, tu  
nema xezîne bibîni.”

*Wê b’şer’ê te qanîh bikê  
Wê b’lefza te mehkûm bikê  
Te j’vê meqsedê meni’ bikê  
Qed bi wî mebe rahmetê*

Go, “Mîrê min ehlê Cizîrê pir hejê di-  
kin, wê bibin terefdarê wî hîç guh mede  
ehlê Cizîrê.”

*Wê ehle Cizîrê bî arîkarî  
Çiqa millet ji te bikin zarzarî  
Qet bi wan mebe guhdarî  
Li millet bêne le’netê*

“Lê Mîrim îşev emir bike” got. “Îşev  
emir nekey feqeh weke mar in, ne cih û  
ne war e. Belkî sibehe here bajareke dî ji  
xwe re bixwîne.”

*Lê Mîrim îşev emir bika  
Palê xiznê îstop bika  
Feqhê Cizîrê hemûwan l’hev top bika  
Da tu bighê se’adetê*

Mîr got, “Wallahî tamam gotina vî  
Filehî yek û yek e.” Temam îşê xwe rast  
kir.

*Mîr rabû rûnişte çema  
Bang kir feqa hem ‘ulema  
Qismek ji qismê hukkema  
Bila bîn ser zîyafetê*

Mîr rabû zîyafeteke wer çêkir, got  
heçike ehlê ‘ilmê ne Tûma gotibûyê da  
hej mewlûdan dikin, mewlûdeke wer



çêbika hej goşt dîkin û bitûnê mela û  
‘alim û feqeha bikşîne ser zîyafetê. Îcar  
ez dê çadirê de bim wextê ez wî nas bi-  
kim ez dê ji te re bejim filankes e. Got,  
“Tu mîrê Bota yî, te ev qedere pare mes-  
ref kirine te nedîye xezîne. Çiqa feqîyê  
hatîye qarşîyê te jî li ser kursîyê rûne  
pêşîya çadirê, her feqehêkî mecîdîkê jî  
bike destê wî da, feqe hej pera dîkin wê  
ji xwe re bikin mesref. Îcar ku min xişxiş  
ji çadirê anî, bizane feqîyê qarşîyê te ew  
a, wî neberda. Êdî serbest berde.” Gotê,  
“Baş e.”

*Ji sê qisman qismek tenê  
Nehatin ehlê xwendinê  
Çûne çolê berkirinê  
Dîsa wek dîsa ‘adefî*

Sê qismê feqehan û ‘aliman hatin  
qismek nehat. Qismê ehlê ‘ilmî heqîqî  
çûn metnê xwe ji derve xwendin, qarşê  
Cizîrê da di wan çeman da xwendin  
heta Ceferû Sadiq heye di qarşîyê Cizîrê  
da zîyaretek e, çûn wê dere metne xwe  
dixwînin. “Di nav wan da” got “Tûma,  
te nedît mala te xirab bîyo” got “min  
hew qa mesref jî kir û min nedî. Ka ev  
çawan çêbû ev feqa kû dê ye.”

*Mîrim emrek muhîm bika  
Gelek melan mehkûm bika  
Terka çend dersan tu bika  
Bika heçî tîştê j’te tê*

Got, “Mîrê min, siqî yonetîmê, emrê  
wê şedîd bika. Heçî mela hene bi ya  
emrê Mîr nakin. Emrekî şedîd wer bika  
bê, ders yasax in li Cizîrê da. Heta ev qa  
feqe nehêne cem min ez wan nebinim.”

*Mîr gote la hewla wela  
Serê min ketiya teşqela*

*Çi b’kim ji zulma van mela  
Nakin j’mîn ra re‘ayetê*

Mîr go, “Melayê ku newê ez ê serê wî  
jê kim.” Emrekî wer şedîd kir. Îcar wey li  
wî melayî ku heta tebeqçîyê xwe jî heta  
temam jî anîn. Gotin, “Heyran werin,  
Mîr dê serê me jê kê. Lazim a çiqa qismê  
feqehan heye em wî ra bînin.”

*Mîr go melan tev bimeşin  
Em hatina we pîr xweş in  
Eger hun gul in, ez kerbeş im  
D’gel min bikin mutaba‘atê*

*Melan emrek mezin kirîn  
Feqê xwe hemî l’hev kom kirîn  
L’ber çadîra mîr hazir kirin  
Bêje Mîrê me, emrê te l’ser me tê*

Timam bûne saf qarşê Mîr da ketine  
hîzayê da. Hêdîka Mîr devê xwe hulo  
guharta got, “Tûma te dît, te nedît, nav  
wa da hey mala te xirab bê. Min hew qa  
mesref kir û ez hetikîm kuro, min nedît,  
ev çawa çêbû, ez ê serê te jê kim kuro.”  
Hêdîka wextê halo gote Tûma.

*Mîr go; Fileh te dî yan te nedî  
Evan deh hezar mecîdî  
Tu b’serê xwe çî b’mîn didî  
Ketim cihê hetîketê*

*Tûma got; Mîrim ma birinc bê kutan  
derd’kevê*

*Ma dew bê keyandin rûn ser d’kevê  
Bila Mîr ber xwe nekevê  
Bika heçî tîştê j’te tê*

Gotê, “Mîrê min ezîyetê bide wan.  
Ma heta ku tu birinc nekutî çoxkê xwe ji  
xwe berdê. Ma heta tu dew nekeyîni kup  
û kup u kup u kup ma rûn didê. Lazim



e tu jî emre xwe şedîd bikî heta ku ev feqîyê derkevê meydanê.”

*Mîr; Mecîd û Qadir rakirin  
Emrek gelek muhîm kirin  
Camî hemî teftêş kirin  
Qet kes negha sîyasetê*

Mîr rabû du xulamê xwe şîyand go, “Herin qîsmê Cizîrê timam sê sed û şêst û şeş camî tê da ne, timaman meyzênin, heta bin hesîran jî seh kin ka ev feqe kû da ye.” Tûma, got, “Mîrê min nehatîye, emrê xwe şedîd bika, dernan da xwe veşartîye.” Çûn herdu xulam hatin gotin, “Mîrê min me nedît.” “Mîrê min du xulamên dî jî rêka. Bila ..... camîyan seh kin. Heta bin kilîmê camîyan, bin hesîran seh kin, cihê tebeqan seh kin. Xwe veşartîye nehatîye.”

*Mîr; Tewfîk û Îbrahîm rakirin  
Hûrik hûrik Cizîr hemî taqîb kirin  
Feqe, Camîya Sewîqe rakirin  
Berê wî dane ezyetê*

Camîya Sewîq jî camîyeke biçûck a, teng a cihê neh deh zelaman tenê tê da heye. Feqe jî ketîye wê camîyê da haya wî bi tu tiştikî tuna. Rûniştîye û qesîdan dinivîse dewam. Muma wî pêxistîye li ber a, ebakî wî lê ya. Carekê Tewfîk û Îbrahîm dane derê camîyê. Got, “Feqa, ma tu ne feqe yî?” Got, “Belê.” Go, “We xêr e babo!” Go, “Rabe ser xwe, me ev bajar ser te .... kirîye, kun kirîye, tu hê vêdê tu rabûye istiraheta xwe dikî.” Go, “Heyran ka derdê we çî ye, qebaheta min çî ye?” Go, “Rabe ser xwe, em çî dibêjine ta.”

*Feqe dikir zarezarî  
Ey Allahim tu settar î*

*Ji mêlakê ez birîndar im  
Feqe birin hebsa reş û tarî*

Bi herdû çengê wî girtina anîna qarşê Mîr. Wextê ku anîna qarşê Mîr, Tûma ha lê mêyzand, go, “Eve feqe ya.” Gotê, “Mîrê min eva ew a, îcar berneda. Bi Încîlê tu berdî êdî ez hew qariş dibim û te xezîne jî nedît.” Wextê hate qarşê Mîr, Mîr çû destê wî maçî kir, go, “Feqe ser çavê min ra hatî.” Mecîdik da destê wî. Go, “Here zadekî bixwe.” Zadek xwar. Got, “Feqe dibên xezînek di vî çemî da ye, ma kû dê ye.” Go, “Îcar Mîrê min ma ez feqîrê Xudê çî zanim. Here ehlê ‘ilmê meyzîna, şêxan meyzîna, xelîfan meyzîna, ‘alimê îcazelî meyzîna, ma ez feqîrê Xudê pîlot im, ma ez muhandis im, ez fen me’emûrî ma, ma ez feqîrê Xudê ez çî zanim xezîna te kû dê ye.” Wer li Mîr kir ku Mîr poşman bû ku gotîyê da. Rabû, go, “Here here babo, ser çavê min ra hatî.” Tûma, go, “Mîrê min neberde wî. Bi Încîlê tu berdî te hew dît. Gazî kê da, xwe ji nav lepê te xilas kir bi fenna.” Careka dî go, “Feqe ka were vira.” Carekê dî got, carekê dî bi fenna bi aqilmendî çû Mîr. Dîsa aqlê Mîr qandirmîş kir. Got, “Mîrê min ez çûme cem vî melayê ha cihê min nekir, ez çûme cem wî şêxê ha berda min, kes guh nadê min. Ez feqehêkî nûh, ez ewamilê dixwînim.” Carekê dî Mîr destûra wî da. Carekê dî Tûma, go, “Mîrê min gazî kê, wê bêjê wî bişîne hebsê. Te hew dî xezîne.” Carekê dî Mîr gazî kire, go, “Ka were feqe.” Rahişte destê wî, go sê çar xulaman, “Wî bibine hebsê.” Rabûn ezîyetê da, nalenala Feqe da ji mêlaka xwe birîndar e, birine hebsê.

Wextê daxilî hebsê bû çû derê hebsê got, “Es-selamûaleykûm werehmetûllah.

Wextê Feqe birine hebsê, selam da ehlê hebsê sê çarekan dere hebsê selama wî veda, ê dî rûniştîne lingê xwe ser hevdû ra avêtina, ê şerqîyê xwe dibêjê, ê lawikê xwe dibêjê, ê dîlokê xwe dibêjê. Me'lûm e hinek deh sal e tê da ne hinek jê panzde sal e tède na, qafayê wan bozûq e. Selama Feqe jî nawergirin. Feqe got, "Heçîke Fileh û heçîke Musilman, îro bera ê File rûnê, ê Musilman rabê." Di fikre wan da ku bera'etekê lêdaye. Got "mirrr" millet qompîle rabû, heft zelumê Fileh û Cuhû hebsê da, mel'lûm e hîngê hukmê Mîrê Bota bû, Fileh jî Cizîrê da hebûn, Cuhî jî hebûn, Êzidî jî hebûn. Heft zelum mane rûniştî, nerabûn. Wextê ku nerabûn Feqe gazî wan kir, go, "Gelî Musilmanan!", go, "Belê", got, "Ev Fileh û Cuhû û Êzidîyê hana, her heft hebê hana ji dîne xwe da ji we çêtir in. Çîmakî ji we çêtir in û meyzêne Filehtî, Cuhûtî û Êzidîtî ser xwe qebûl kirin, nerabûn û hun rabûn. Keenehû 'efû û beraat jî lê dabana qebûl kirine, narabin. Dibên bera em Fileh û Cuhû û Êzidî bin, em narabin, qebûl kirine. Vêca ka musilmanetîya we, xwelî serê we û musilmanetîya we bê. Min selama Xudê selam kire ser we, we selama Xuda nevegerand." Gotin, "Ezbenî qusûra me 'efû bika, wallah qafayê me bozûq bû. Me selam neveda me xwe ji bîr kir." Got, "Heçî nimêj dikin werin, heçî nimêj nakin tîla xwe hildin." Di nav wî qa milletî da duduwan tenê nimêj dikirin. Ka çend sed heb di hebsê de duduwan tenê nimêj dikir. Got, "Heçîyê Qur'anê dîzanê bila tîlîya xwe rakê." Kesê tîla xwe nerakir. Ji nû Feqe cûzûtka elîfbêtkê ji wan ra

çêkirîye. Gotîye, "Babo, de werin manê her em ê di vê hebsê da na. Îcar ka heta em bîmrîn ez ê ji we ra Qur'anê teblîx bikim, rukne dîne Îslamê ji we ra teblîx bikim. Her em wê di hebsê da ne." Îcar li dora wî hatne hevdû. Cuzûtka elîfbêtkê ji wan ra çêkir û dîrsa elîfbêtkê da wan. Wê Qur'anê bi wan ra didê xwendin.

Îcar em dê hêne li ser qiseta Mîr. Mîr, go, "Tûma", go, "Belê", go, "Eve min Feqe kire hebsê da jî û min ev xezîna ha nedî. Min çî jê fam kir lawo." Go, "Ez ê serê te jê kim kuro." Go, "Mîrê min", go, "Belê", "Eger min xezîne pê derne-xist serê min ber Mîr sekinîye. Kengî divê serê min jê ke." Got, "Çawan", go, "Heçîke ev Feqê hena ya, qederê deh panzde rojan heftîkê, panzde rokî taştîya wî, firavîna wî, şîva wî bibe hebsê jê ra ku têra hebisçîyan temaman bikê, belkî ji sifra te fedî bikê." Gotê, "Baş e Tûma, ez ê vê jî kim, heke dernexist ez ê mala te xerab bikim." Go, "Ez sekinî me li ber Mîrê xwe." Rabû îcar ka her sibê neh deh berxa neh deh kahrî wî ser jê kir û birincî û hîşênê deynê ser qazanê. Birincî ber derê hebsê qederê sed zelumê wî digirin. Dibine derê hebsê, dibêjinê, "Ew çî ye? Dibêjin, "Taştêya Feqe ye, Mîrê Botan jê ra rêkirîye." Ehlê hebsê wer wan hat qirika wan li ber nîran ra neçû. Hindî better bûn goşt û kebab û birinc û .... dixwin. Gotin, "Xwedê, vî Feqeyî serê ma zêde bikî rabbî. Daîman em ê xizmeta vî feqîyî bikin. Piştî ku Mîrê Botan xwarîna wî jê ra dişehînî muheqeq feqehê meqbûl a. Belkî saya Xuda, saya wî em bêne berdan jî." Panzde roj pê ve çûn her sibehan, nava rojê û êvaran şîva wî

jî hakeza eynî dibe jê ra. Carkê dî xweste îfadê got, “Feqe”, got, “Belê”, got, “Ma tu dibêy ev xezne di kû dê ye.” Got, “Mîrê min ma qey ez muhandis im, ez yûksek muhandis im, ez feqîrê Xudê çi zanim. Ez jî weke te me.” Carkeke dî got, “Bibne hebsê.” Birine hebsê. Got, “Tûma”, got, “Belê”, got, “Eva negot. Ez ê serê te jê kim, ka şûrê min.” Got, “Mîrê min îcar heta niha Feqe xweşîyê da bû belkî xwe winda kirîye. Panzde şev û panzde rojan ne zad ne avê yasax bika, ehlê hebsê da jî hinek bidinê, serê wan jê ka. Belkî ezîyetê bibînî îcar ji te ra bibêje.” Got, “Ez ê vê jî bikim. Eger derneket ez ê serê te jê kim.” Got, “Ez ê sekinî me.” Emrek da ehlê hebsê ku heçî avkê jî bide vî feqîyî heçî zadekî, nankî bide vî feqîyî ez ê serê wî jê kim.” Îcar ew Feqîyê lezzetlî û nav wê ne’metê da îcar .... kir û kire tek hucrê da. Tek hucre jî odeke tenê ye qarîşî Borê Mirîşkan da ye, qarîşî surhê da ye. Pencereyek biçûk tê da ye di alîyê çeman da dimeyîzî, hêla hebsê da ya. Kire wê hucrê da. Ehlê hebsê newêrabûn ne rehmkê lê bikin ne cixarekê bidinê da ne avkê bidinê ne zadkî bidinê. Emre Mîr newêrin bişkênin.

Feqehê hevalê wî hebû dilê wî pê şewitî her sibeh nanekî sêlê û hinek lorikê koçeran dikire nav da, dikire tûrikê xwe da û ev cewtikê Mûsilî heya, çadır a, avê têxinê da, şivan ji xwe ra dibine ber pez, ew jî tije av dikê tûrikê xwe da û wê pencerekê ra tavêje Feqe ra. Her roj nanekî û avê jêra tavêje. Panzdeh roj û panzdeh şevên Feqe qedîyan, me’lûm e hevalê wî xweyî dikir wira bi dizî, piştî mexreba tarî di wira ... Carkê dî anîne

îfadê me’de Feqe lê ya, te digot xwe tiştek pê nehatîya, te digot qey şev û ro goşt û birincê dixwê. Dîsa îfada wî girt gotê, “Mîrê min ez feqîrê Xudê dê çi zanim li kû dê ye. Ez nizanîm xezîna te kû derê ye.” Mîr, got, “Carkê dî wî bibine hebsê.” Birine hebsê, got, “Tûma, eve derneket, negot.” Got, “Mîrê min, min me’de wî dît hineke Musilman xwarinê bi dizî didinê wî. Heçî hun Musilman in, nurha îmanê di qelbê we da ye. Yek ji Şamê bê yek ji Bexdayê bê dibên em Musilman birê hevdu ne, rehmkê li hev dikin. Hinekê bi dizî xwarinê didine vî feqîrî. Îcar nobetçîyan ber deyne bera nobetçî Fileh bin. Dora hebsê wî ê ku bi dizî xwarinê didê wî bira yaqalamiş bikin.” Ê got, “Baş e Tûma, ez ê vê jî bikim.”

Rabû dora hebsê qalib dan, deh panzde zelum nobetçî Fileh dizî dora hebsê, êvarê feqê hevalê wî diçê xwarinê be jê ra, qirika Feqe girt. Gotê, “Tu dê çi ji vê xwarinê kî?” Got, “Wallah ez ê bibim bo Feqîyê hane ê zozanan.” Anîne qarşê Mîr. Mîr, got, “Dêmek te emrê min şkandîye, ez ê serê vî feqîyî jê kim.” ‘Îlm geha feqîyê Cizîrê, sê sed û şêst û şeş camî na, her camîkê çil pênçî feqe tê da hena, îcar kanê çend hezar feqe dikin. Got, “Babo Mîrê Botan feqehê ji me kire hebsê da yekî girtîye, dibêje ez ê sibehî serê wî jê kim. Dêmek fermana me feqeha, Mîrê Botan wê rakê. Ev pilana ha gotîye ji Filehan lê ketîya. Şevê dî Fileh nobetçîyê dorê hebsê bûn, ev pilane hebît ji filehan lê ketîya. Sibehî qetlî’am e di nav Filehan da. Lazim a em û Fileh herba xwe bikin.” Wey wî feqîyî wê rahêjê şûrê xwe, baltê xwe û rahêjê

kêra xwe û sibeyî di nava soçaq û kolanê Cizîrê Botan ketin. Neh dehek vir avêtin erdê, pênc şeşek wir avêtin erdê. Qederê neh dehekan birîndar kirin, neh dehek kuştin. Filehan qompîle xwe li Birca Belê girt. Çûne cem Mîr, gotin, “Mîrê min yan tu ê van herdû feqehan bera’et bikî yan bi Xwedê feqehan em qelandin. Neh dehek em kuştin, neh dehek birîndar kirin û neh dehek esîr kirin. Çarekê bika.” Mîr, got, “Xêr e, her kes bera belav bibin ez ê van feqehan bera’et bikim.” Feqehê dî jî heta wilo sê çar ro herbê dewam kir. Sê çar ro pê va çû Feqa ma bê zad û bê av. Kesê rehim lê nekir. Hema hal tê ma ye. Ji nêza û têhna da. Carkê dî jî Mîr, go, “Ez ê wî xwazim îfadê, eger got, got. Negot ez ê wî bare’at bikim. Da ev tehlîka hanê jî ji nav bajêr da derkevê.” Anîne îfadê Mîr, got, “Feqe”, got, “Lebê Mîrê min”, gotê, “Lawo be tu dibêy ev xezîne kû dê ye?” Got, “Mîrim heke Xudayê ‘alemê emir bike ez ê bejim ji Mîrê xwe ra.” Gotê, “Dê bêjî”, gotê, “Belê” gotê, “Her kes daxilmîş bibê, herin malê xwe, xêr e.” Zadek anîn danîne ber Feqe. Hêdî hêdî Mîr bi destê xwe dikê devê Feqî, xwarinê hûr dikê jê ra. Hereketsiz bûye, heta karîbû nimêj bikê ji pê nimêj kir, hew karîbû rûniştî nimêj kir, hew karîbû li ser tenîştê nimêj kir. Weke ku ayeta Qur’anê gotî. Hew karîbû tehêlkê nimêş kir. Heta hereketsiz bû, xweste îfadê. Zad daye, aqilê Feqe hate serê wî.

Got, “Mîrê min”, go, “Belê”, “Ez dê xezîne ji Mîrê xwe ra bêjim. Lê feqet tiştê ku ez jî bêjim Mîrê min lazim a emrê min jî pêkbînî.” Got, “Ser serê min, bi mal û can ve ez ji te ra sekinî me.” Got, “Mîrê

min ji qîsmê heywanan”, Feqîyê Teyran pê ket, “Lazim e sed çêlekî, sed gayî, sed beranî, sed bizini, sed kahrî, sed berxî, sed devehî, sed qantirî, sed kûçikî” û qîsmê heywanan ket sedased “Lazim e tu ji min ra bînî, di vî çemî da tu ser jê bikî. Ticara berde dinyayê bera heywanan bînî, ji min ra di vî çemî da ser jê kî. Heçîyê heywana goştê wê tê xwarin qesab ber ‘eyarê wan ..... ” Mîrê Botan emrî ticaran kir û ticar berdane dinyayê û pere dane ticaran. Îcar heywanê ze’îf û fîyetê biha. Feqîr û fuqera îcar heywanê xwe firotin û anîn wî çemî da ser jê kirin. Herçî heywana goştê wê tê xwarin ‘eyarê wê ser ve dihilînê teslîmê Feqe dikê. Feqe wan dike depoyê da. Îcar muşterîyê ‘eyaran ji Sasonê ji Dêrsimê hatina ji Feqîyê Teyran kirîne. Van peran jî li hev toplamîş dike didê feqehê Cizîrê. Edresa wan cem xwe nivîsiye.

Îcar [teyr] wê herin li ser laşan goşt bixwin. Qîza wê got, “Dayê”, got, “Lebê qîza min.” “Rebbî ewê ku ev ‘ezîme ji me ra çêkirî Xudayê ‘alemê wî bibe biheştê.” Got, “Qîza min, ma tu wî nas nakî.” Got, “Na daye, min nedîtîya.” “Ew Feqe Mihemedê Ertoşî ya, ‘eslê wî ji Mako ya, padîşahê me ya, zimanê me zanê. Mîrê Botan lê bûye ‘înad, dibêjê ‘yan tu yê xezîna min derînî yan ez ê serê te jê kim.’ Ev pîlana ha jî Tûma lê girtîya. Tûma jî wî dibînê di çadirê da ye. Ev qencîya ku Feqe pê kirî û zozanan bi xwe ra xirxirandî û de îcar neheqîya ku hatîye ser Feqe ser vî Filehî. Di çemê Qesrikê da jî filan teyrî û filan teyrî jî jê ra gotin ku ‘Tûma yê bi te xaîn bê.’ ‘Got ma yê çima li min xaîn bê.’ ‘Gotin heta

bi ser te bê.’ Aha eve ye bi ser da hat û Tûma lê xaîn bû. Ev şahdebûna han Tûma lêda.” Qîza wê got, “Dayê”, got, “Belê”, got, “Feqehî ev qencîya ha ji me re kirîye, min soz bê ez sibehî bi rohilat ra, bi zeraqa rojê ra ser devê xezîne ez hêk bikim. Ez vî feqîyî ji ezîyetê derînim.” Dîya wê nikilek li serê wê da got, “Qîza min, padîşahê me heya, amirê me heya, wê serê te jê kin.” Got, “Hema ruhê min fedaê vî Feqehî.” Feqe serê xwe rakir ji nav laşan got, “Cezakellahû xeyran, kesîran ya heywana Xudê.” Ewê jî cewaba wê da got, “Guhê te li min bî ku rojê avête dinyayê, çavê te li min bî ez ê li ser devê xezîne hêk kim. Mizgînî min li te.” Got, “Mizgîna te ya xêrê bê.”

Wextê bû roj refrefa teyra roj derket, Feqe jî nizanê ku teyr bû. Dibê teyrîk e, biçûçîk weke ferûca mirîşkê mişên ketîye ji nivê teyran xwe avêtiye nivê cem hêkek li erde kir û rabû. Bû şîqşîqa padîşahê teyran got, “Pey wê da herin, wê bê izna min xezîne derxist. Hê teyr mane, negehane ser hîssa xwe bixwin, ji beledan hê tèn, bê izna min çawan xezîne derxist.” Heywan jî xelas bû kes negehayê da. Feqîyê Teyran çû xîşkik li dora hêka wê anî. Gazî yekî kir got, “Here bêje Mîrê Botan, were xezîna te derket.”

Mîrê Botan hat, got, “Feqe”, got, “Belê”, “Xezîne derket”, got, “Belê derket.” Got, “Kû de ye? Got, “Aha bin vî hêkê da ye.” Got, “De ka pêncsed ‘emelê min heye, ez gazî wan bikim.” Got, “Na Mîrê min, ‘emelê min eyrî hene. Lazim e ez ‘emelan bigirim.” Got, “Çil barê deveha ye, her rojê roja ‘emela ez ê zêrekî

bidim wan. Qey barê devehekî ez bidime ‘emelan. Çil kême yek bar jî ji te ra bimênê.” Got, “Belê Feqe, tu zanî, hema tu derxê tu zanî.” Rabû îcar çend feqe û mela û şêx û xelîfe di Cizîra Botan da hebûn Feqe şîyande pey wan, gote her yekî, “Qazma û kûrekê xwe bînin, werin ‘emelê.” Roja wan bi zêrekî. Ê wey li wî melayî, wey li wî sofiyî îcar riha xwe bikê devê xwe da û zêrek pir e. Hatin kulpênî ji erdê anîn. Feqe gotê, “Bes e, tamam.” Pênc deqe tepûtep got, “Bes e, tamam. Kes qarîş nebin heta êvarî suhbeta xwe bikin, qesîda ji xwe ra bibêjin, werdê xwe bikşênin. Heta êvarî ji xwe ra sohbetê bikin.” Roja dî dîsa hakeza. Sih rojî lê şuxulîne, her yekî sih zêr kir. ‘Eslê wê bostek axê li ser xezîne nebû. Xaya Feqe ku ew têt pere bibin da tişteke bigehê wan. Nikilê kulingê feqehekî qa-qîba xezîna ‘ewilî ket. Qaqib ser hevdû ne, çil qaqib in. Zêr derket. Teptep serê wî anîn, gotin, “Mala te xirab bê te çî zû derxist.” Got, “Heyran Xuda qebûl neke, heyata musteqerre ji vî axê ra nema, bes a. Ev sih roje em lê dixebitin ma me çî îş kirîya.” Gotin, “Ûlm bidine Mîr vaye xezîne derket.”

Mîr keyfa wî hat, hat ser derê xezîne, got, “Feqe”, got, “Belê”, “Derket”, got, “Belê.” Îcar her çil qaqib derxistin, hel-pisartine hevdû wêdê. Mîr, got, “Feqe”, got, “Belê, got, “Xaya min ew bû xezîne derkevê. Ez ne ..... wê ketibûm, ji min ra bûbû derd. De bêje te bivê nivî ta nivî min, te bivê sê behre ta behrek ji min re, te bivê tevî ji te ra eleqê min jê tuna.” Got, “Na Mîrim, şertekî min jî heye.” Got, “Beje Feqe.” Got, “Walla serê Mîr,

ku ne tu li ber serê Tûma zêran ji min ra bixşênî ez razî nebim. Îcar keyfa Mîr e.” Got, “Tûma kî ye?” Got, “Ew zelamê te, ku pê dişewirî çadirê da, ev çend heyîve te kirîye çadirê te veşartîye ji tirsê min. Here wî derîne serê wî bîne vêdê, jê ka, da kes xaîntîyê wer li hevalê xwe neke.” Mîr, got, “Herin bêjin wî bera bê vê derê.” Gotin, “Tûma, Mîr gotîye bera ‘ecele bê vir, xezîne derketîye, mizgînî min li te.” Keyfa Tûma hat, got, “Kî cem Mîrî ye.” Got, “Feqe”, got, “Feqe, bi min zanê ku ez vir im.” Got, “Feqe gotîye bera Tûma bê.” Rahê dile Tûma berda. Qebzekê diçê yekê şûn da tê. Qarişê Feqe ket, Feqe, got, “Tûma, wer wer wer, wextê Gelîyê Qesrikê teyran got tê bîra te.” Got, “Belê”, got, “Aha binêr hate rîya min qencîya ku min bi te kirî, te neqencî kire dewşê. Te serê min bire ber birînê, Xudayê ‘alemê min hate rehmê.” Mîr, got, “Tûma, got, “Ha”, got, “Gelekê weke te qarişê feqê me Musilmanan radibin.” Got, “Mîrê min, min xezîne ji te ra pê derxist.” Got, “Zêde neştexile gawir”, şûrek avête serê Tûma, serê wî jê kir, anî terazîyê da. Serê wî danî û zêr avêt fera mêzînê dî û çiqas avêt tê da, çiqas avêt tê da dernehat. Serê Tûma ma li erdê dimênî û mêzîn diçê hewa. Rabûn du qaqibê dimsê hebûn ku dims tê da dikelandin, beroş reza dibêjin wan, ..... û savara tê da dikelinin, kirne mêzîn û dar êxistinê da. Serê wî kirin yekê da û ya dî tijî zêr kirin kengî serê wî ji erdê hilat. Feqîyê Teyran, got, “Mîrê min”, got, “Belê”, got, “Musa‘ada te hebê”, got, “Kerem ke.” Rabû libek ax kire devê Tûma, kire çavê wî da û kulmek zêr

avête fera mêzînê, berberî hevdû bûn. Got, “Mîrê min serê wî ne ji axê têr bixwo ji malê dinyayê têr nabê. De îcar ev li ber serê wî hatîya ez ê vî kulma zêrî, bîst sih zêrî ez ê bim zarokê wî sêwî na, hatîye kuştin ez ê van zêran bidime zarokên wî weraseta babê wa ye. Xwîna babê we ez ê bejim min ji we ra anîye, xelkê babê we kuşt waye min xwîna wî anî ji we ra. De mîrê min xatirê ta û min zêrê ta jî navê.” Her Mîrê Botan got, “Feqe, were kerem ke zêrê xwe têra xwe bibe.” Gotê, “Na Mîrê min, Xudayê ‘alemê ji min ra kafi ya, ez ne muhtacê zêrê te ma.” Ji ber Mîr bû rast, berê xwe da Ava Mezin. Qarişê Birca Belek ra lêda ber avê ra meşî çû geha Mîr Hesên qarişê avê da Mîr Hesên heye bexçek e kete wê derê da.

### Beşa Duyem

Di beravêra dimeşê geha qarişê Gelîyê Qesrikê banî ket. Îcar Ava Mezin eşqa Xuda girtîya, aqil serê wî hubba Xuda lê daye. Îcar qesîde avête ser avê, av kete pêşîya wî da. Gote Ava Mezin, “Tu ji kû tê, tê çi kû dê û tu ji kengî ve dinyayê da çêbûya, derde te çi ya, xaya te çi ya, ev çi mirmir û nalnala ji nava te tê? Tu nahêlê millet razê.” Ava Mezin niha bêdeng e, tobe kirîye ber destê Feqîyê Teyran ku ez nehêlim deng ji nava min bê. Berîya hîngê denge Ava Mezin li Çîyayê Şingalê disekinî. Ji mirmir û nalnala wê. Îcar nihe çemikik, bostek di nava gunda ra dimeşê çi şehşeh jê tê. De îcar ew nehîta Ava Mezin wextê ku dihat qirqir û nalnala wê kes nediraza ji heybetê Xuda. Îcar qesîde avête ser; tê çi kû? Wextê nebîyan



da tu hebûy, tunebûy? Wextê bavê me  
yî Adem da tu hebûy, tunebûy? Sual ji  
avê dikê qesîdetî û eşqê girtîye diavêje  
ser avê. Av jî lê dihisênê buhûrê. Wî jî  
daye nav avê, avê daye ser kaboka wî û  
qesîda tavêje ser avê.

*Ey av û av ey av û av  
Ma tu bi 'îşq û muhbet î  
Mewc û pêlan tavêy belav  
Bêsekne û bêrahet î*

*Bêrahet û bêsekne yî  
Yan 'aşîqê baxê xwe yî  
Yan şubhetî qelbê me yî  
Tu jî 'îşqa kê natebîfî*

*Jî 'îşqa kê jê têy û têy  
Heta kengî tu bêy û bêy  
J'bo min bêje heyrana te bim  
Tu j'kê ra dikî vê ta'etê*

*Tu j'kê ra dikey zîkrê bi hal  
Qet guşguş û vê mîrmîrê nakey betal  
Di şubhetî ev meh û sal  
Lê şev û rojan te xew netê*

*Şev û rojan tu bê xew î  
J'ber ezyeta kê ditewî  
Çi sebeb e tu nahewî  
Lê şev û rojan tu l'dawetê*

*Şev û rojan dawet dikey  
Ku kete çîlê zîstanê qetlê dikey  
Ma ne zulm e tu vê dikey  
Qey tu natîrsî j'rebbê 'îzzetê*

*Şev û rojan tu bê xew î  
J'ber muhbeta kê ditewî  
Şevtarîyan qet nahewî  
Daîm diçî dengê te tê*

*Dengê te tê bê pê û hev  
Ta'et dikey bê qelb û dev  
Peyda dibin j'te mewc û kef  
Subhan ji şahê qudretê*

*Geh geh sipî şubhetî şîr  
Qet mislê te nînin tu tîr  
Dengê te tê, yar têne bîr  
Meyla hebîb j'çûna te tê*

Evî qasî dibêjê avê sualê jê dikê.  
“Muheqeq” got, “muhibbek te heye yan  
dosteke te heye yan telebeke te heye, ji  
lew tu bêedeb î, tu tazî yî. Heya te nîne  
nexwe heya niha te cewabek ji min ra  
dabû.” Vî qasî te'nê didê avê.

*Lazim te mehbûbek heye  
Yan dost û metlûbek heye  
Yan meyl û mensûbek heye  
Lew tazî yî, bê keswet î*

*Lew bê lîbas û tazî yî  
Tu b'reqs û seyr û gazî yî  
Tu j'kê ra dikey şahbazîyê  
Geryam di mehra xurbetê*

*Geryam di ber mehra dinê  
Qet nahewê, nahedinê  
Wek şubhetê qelbê minê  
Bi dest dikşênî muhbetê*

*Zehmetpurê, muhbetgeşê  
Lê te nazîkê teb'et xweşê  
Bê ruh li erdê dimeşê  
Bê dest û pê tu j'kû ve tê, tê b'kû ve çî*

*Bê dest û pê, bê çeng û per  
Ev pêl û mewc û fetl û ger  
Tu j'kê ra dikey ev gir û xer  
Nakey beyana 'îlletê*



*Vê ‘illetê beyan bika  
Bes vî sirî l’min sitar bika  
Carek li min izhar bika  
Da ez bizanim hey’etê*

*Da ez bizanim vî sirî  
Tu j’hindikî têt yan ji pirî  
Ji me’naya vê gîrgîrê  
Tu j’kê ra dikey vê ta’etê*

*Yan ez bizanim mes’elê  
Cuz’ek ji behsa ewwelê  
Ji bunyadbûna menzelê  
Dewran û çerxa ‘adetê*

*Bê, darê dunya sertemî  
Tu ava Rebbê ‘alem î  
Tu hadis î yan qidem î  
Yan tu nizanî tiştêkî*

“Yan tu ne tu tiştikî yan tu ji binî ne tu yî yan tu ji min re bêjî derdê te çi ye, tu ji kengî ve wiha yî û herî kû, xaya te çi ye?” Vî qasî av lê dihisênî, avê ji nû cewaba wî bidê.

*Avê digo; ez ava Rebbê zulcelal  
Borîn li min çend meh û sal  
Qet kes nekîr j’min ev sual  
Hetta geham vê sa’etê*

*Hetta gehame vê demê  
Ma yekî weke te nebû pişta Ademê  
Ma kes nebû d’vê ‘alemê  
Bifikre halê vî şetî*

*Xelqê Xudê ‘aqil kirî  
Hem ‘arif û kamil kirî  
Nûrhek di dil da hilkirî  
Eslê qisê wê b’ser me tê*

Avê got, “Feqe”, got, “Belê”, got, “Musilmanê feqîr, ne ‘ilmê te heye ne wextê te heye, tu weke dînekî yî, weke heywanekî yî, tu bê teftêş van pirsan dikê. Ma haşa tu ji wan nebîyan, wan welîyan, ji wan pêximberan mestir î. Ji bavê me Adem heya bighê te, ara we da sê sed û bîst û çar hezar pêximber rabûne, xeyrî ewlîyan. Ka qey tu van qasan mestir î ku kesê suala vê avê nekirîya. Tu îro vê sualê ji min dikê.”

*Avê go; ey Feqê muslimê bê ‘ilm û xet  
Tu mecnûn û heywan û sifet  
Bê teftêşî pirsan diket  
Bê rûhnîmakê babetî*

*Pirsa Feqe bi cih nebû  
Lewra di Qur’anê hebû  
‘Erşê Xudê li ser te bû  
Avê gelo bîra te têt?*

*Avê cewab da ev sexîn  
Ziman nebû hal û kewnemîn  
Remzek ji padişahê mezin  
Subhan ji vî seltenetî*

*Subhan ji me‘bûdê li ser  
Kê ji Xudê ra b’dit xeber  
Em çarek in anîne der  
Genc bûn di kenza qudretê*

*Îro werin lazim werin  
Lê cîran û xelqê Hêşetê  
Hun ra’yekê li min bikin  
Îro qewî gîryê min tê*

Gîryê Feqe hat, avê, got, “Megrî, ez ê te şehînime mala xaleta te, tu biseki-ne.”

*Iro ji min qewî girîn  
Lê sosin li mêrgan xeyirîn  
Sed heyfa wan lêvêd şekerîn  
Êdî venaxon şerbetê*

*Ew lêvê le'lê nû şeker  
J'wan kê m dibû dewr û xeber  
Sed ah û kovan û keser  
Heyf 'eyn û lam çûn hîcretê*

*Heyf 'eyn û lam jêk bûn cuda  
Lê huzn û girî dîsa te da  
Ez razî me b'emrê Xuda  
Heçî ji dergahê te tê*

*Heçî dikê ew mîr dikê  
Xeyr û şeran teqdir dikê  
Daxa li qelbim pîr dikê  
Sotim bi narê firqetê*

*Sohtim bi pêta agirî  
Vê fanîyê em hûr kirî  
Kulek di dil da çêkirî  
Ey felekê bê mirwetê*

*Kahnî dizên co jê diçin  
Hindî Xudê dan ins û cin  
Avê go, qet kes nekir ev pîrs ji min  
J'nav enbîyayê ummetê*

Avê gotê, “Feqe rûne, hew qa nebî û pêximber û resûl di ummetê da rabûne, ummetê xwe da kesî ev suale ji min nekirîye. Rûne ser dûvê xwe, ez ê te bişnime mala xaleta te.” Feqe kengî dirûnê. Mînet ji hev naînin.

## **Beşa Sêyem**

*Feqe got;  
Ew nebî bûn ez Feqe ma  
Ew 'aqil bûn ez serserîyek şubhê te ma  
Ez muhtacê pîrsa te ma  
Lê bes min bika vê şîretê*

*Ava mezin qirqir meka  
Zikrê Xudê bika, fexrê meka  
Tu ehlê Xudê 'aciz meka  
Bes min bide vê ezyetê*

Avê got, “Tu li min û vî awareyî binêr. Ez çîqa dibêjimê ‘aqil nagirê, de biseki-ne.”

*Ava mezin lev şewirî  
Pêla pêşî j'Feqe 'enirî  
Dav dav li Feqe zivirî  
Da em bavêjîn dîyarê zulmetê*

*Gava Feqe xwe têk dida  
Pêla pêşî xwe l'stû dida  
Feqe girt û bir û l'gêrê dida  
Got here bimre l'vê hesretê*

Feqe lê du çiqil bû û rahişte Feqe, got, “girrî” avête gêrê. Westê avête gêrê, gêrê nava xwe da bir û anî, bin av dikir û ser av dibê, av dikevê devê wî da. Çara Feqe nema.

*Gava Feqe avê j'cih rakirî  
Şal û 'eba j'mila kirî  
Serqot û ew pêxas kirî  
Berê wî daye Hêşetê*

*Çaxê Ava Mezin ev yek kirî  
Feqe bêserûber kirî  
Pêla pêşî Feqe zirt kirî  
Berê wî dane xurbetê*

*Avê digot Feqê reben wey muste'îd  
Lê sed wek te xazî û şehîd  
Min van neval û bestan kirne qedîd  
Lê teyran dane xesaretê*

Avê gazî kirîyê got, “Feqeo, feqîro, rebeno, muste'îdo, sedî weke te xazî û şehîd, di xezwa kafiran da şehîd bûn herbê da, min nava xwe da xeniqandin. Min kirne qismetê teyrikan, nava min da teyrik û masîyan xwar. Îcar tu îro hatîye forsa xwe li min dikê. Qarişê vîşê min neba.” Feqe, serê wî ser av bûye, bin av bûye. Av ketîye ûrê wî da, betnê wî da, sere wî ser av bû, gazî teyran kir, îmdada xwe gehande Xuda û teyran. Teyr jî qafê çîya ya, guhdarê avê na, berberî feqe na. Ka emrekî gazî wan nakî.

*Feqe dikir hewara van teyran  
van tûtîyan  
Lê teyrik girîn serê çîyan  
Teyran bang kirin masîyan  
Lê herine zîyaretê*

Teyran bang kire masîyan, got, “Binêr, zîyaretîya wî bikin, wî tewaf bikin. Lê wallah hun devê xwe bikinê, hun goştê wî bixwin em ê we tamamen qelêhîn.” Teyran gote masîyan;

*Laşê Feqe xirab nekin  
Hestî û rah j'hev qut nekin  
Bê dewr û bê yasîn nekin  
Da xelk jê b'kin menfî'etê*

Çîqa av ban dike masîya, dibe, “Hilol kuro vaye min avêtîye gerê, min ji we re anîye, rizqê we anîye ber devê we de bixwin.” Masî newêrin tengî bidin. Dibên, “Walla ‘eleqê me jê tuna.” Av jî hîsa teyra dikê ku çî dibêjine masîya.

*Avê digot Feqî j'kû a  
Yan Miksî ya, ê jinbî ya*

*Mihacir a, jor hatîya  
Masîno herin zîyafetê*

Avê gote masîya, “Guh medinê, ez zanîm ji ku hatîye, bêxwedîya, ê Tênisîya, pîreka wî jî jinebîya, zarokê wî jî tuna ku sera bên hinek, mihacir e, ji memleketê jor hatîya, min zîyafeteke we li erdê danîye, bixwin.”

*Dema feqe xwe d'fikirî  
Ser hildida, ser digirî  
Digot ya reb em şakirî  
Ji te dixwazim quwetê*

*Xuda cih da hîmmet kirî  
Ava Mezin hevsar kirî  
Feqe l'avê derbaz kirî  
Hun guh bidin vê hîkmetê*

Feqe lingekî xwe avête wî milî yek avête vî milî. Got, “Avê”, got, “Ha”, go, “Îcar were min, tu bêminet î.”

*Gava Feqe l'qamê dida  
Pêla pêşîn navê dida  
Sed şukr û sed ahda dida  
Ku xilas bim j'vê ezîyetê*

Avê got, “Îcar ez ketime ezîyetê da, nema dihêlê ez biborim jî. Av tê lê disekinî dibe baraj pêşîya avê da. Çîqa av tê lê disekinî û serî wî çû erşê Xuda.”

*Ava Mezin xwe lêk dida  
Lê pêla berîn li ba dida  
Hemyan pêkve hucûm dida  
Pêlan hat û çokan dida*

*Gava Feqe avê seyirî  
Lingik ji vir da wî milî  
Digo avê were heke tu qabil î  
Dom kin, bikin 'eşîretî*

Go, “De avê îcar were, eger tu mêr î û tu berbere min î, ez û tu dê eşîrkî biçîne hevdû.”

*Gava Feqe li avê rîkinî  
Pêla pêşî hat û Feqe sekini  
Feqe gote avê ma tu berbere min î  
Wer da em bikin mucadeletê*

Îcar av ma sekini, nikare biborê. Av kelî di halê xwe da. Kelî gazî pêlê paş kir. Îcar pêla ku tê çokan dikevê divegerê paş da, gazî ya paş dike, gava her hukmê min îbtal bû ka bêje tu tiştikî jê nakî.

*Pêla pêşî digot ya paş  
Esker bigir, taze bikêş  
Feqe bigir, ji cih bimeş  
Bavêjin dîyarê xurbetê*

*Pêla paşîn digot we ya  
Lê ne b’henek a, ev Feqe ya  
Ma ew kelha mîrê me ya  
Em talan bikin vê sa’etê*

Gotin, “Walla eger Birca Belek jî ba, ya mîrê Bota jî ba me ê sanîyekê da avêtbaya. Îcar ji kelha mîr jî zêdetir e. Hukmê me ketîye em nikarin.”

*Ji kelha mîrê zêdetira  
Lê j’hizar hostan zanatira  
Sed rêz pêkve lê kirî  
Lê sikrek daye nû vî şetî*

Hukmê pêlan îbtal bû. Îcar ava nerm meşweret li hev da. Ava pêl tiştikî nakin ka em ê tiştikî jê kin. Pêlan gote ava nerm, go, “Zanî çi ya?” Got, “Belê”, got, “De îcar bin pîyê wî bikolin, tiştikî min bin pîyê wî rakin heta hun bin pîyê wî cih bikin îcar ez ê wî bibim.”

*Avê got min xef bikin, min xef bikin  
Vê domkê Feqe mijûl bikin  
Kuçkî j’min ra binê lingê wî hîlbikin  
Da wî belav kim vî şetî*

Wextê ku te wer kir hema ez jî wî bidime erdê. Bine lingê wî bikolin da îcar ez wî bidime erdê.

*Feqe go tevr û kuling bê fayde na  
Lê ez wek hesinê tûtya xwe ma  
Ti çarê ne karê te na  
Haza ji sen’ê qudretî*

*J’nû Ava Mezin lev fitilî  
Pêla çû, da serê gelî  
Teyrik li ser daran firî  
Dan wesfê rebbê ‘izzetê*

Îcar av ser çîyayê Botan ket, avê da heta bine hêlînê teyra jî, teyr ser hêlînê xwe firîn. Vî qasî Feqe pey suala xwe da ye, dibê avê tê çi kû her sualê jê dikê.

*Feqe got, Ava Mezin bes himhima  
Domkê rûnê j’min ra bikêlima  
Tu ‘aciz î, şevkê j’xewê rabe  
binewima*

*Lê bîstkê were îstîrahetê*

Wextê wer gotîyê da îcar av kelî di nava xwe da girî, hew kare herê. Îcar av wê şikayeta wî cem Xudayê ‘alemê ke.

*Ava Mezin rûnişt girî  
Rebbê mezin gazî avê kirî, qey tu d’girî  
Avê digot ya rebbî vî zalimi ev yek kirî  
Lê masî ketne xesaretê*

Xudayê ‘alemê gote avê, “Çima tu digirî?” Got, “Ya rebbî, ma tu nabînî vî zalimi çi ji min kir. Zulmê li min dikê, tu dibênî masî li Bexdayê temam bej man, ketne hîlakê da.” Îcar av, sebba wî cem Xudayê ‘alemê dikê.

*Ya rebbî ev zalim e, ne feqe ya  
Lê ne ‘alim e, cabir b’xwe ya  
Bû mani‘ê hukmê te ya  
Lê pêk nayê îşê ummetê*

Avê got, “Ya rebbî, tu dibênî eve zalim a, ne feqe ya, ne ‘alim e jî, cabirê hukmê xwe ye. Bû mani‘ê hukmê te ya. Ez bi hukmê te diçim û têm, îcar nahêlê. Heke ez neçim îşê ummetê pêk nayê.”

*Rebbê mezin mizgîn dida  
Ji bo avê cewab dida  
Lê min destûra Feqe dida  
Jê ra bika re‘ayetê*

*Lewra Feqe her dilkul e  
J’tirsê Xuda her çavşil e  
Xweş me’mûra, pîr zakir a  
Lê belkî li te bê rehetê*

Xudayê ‘alemê gotê, “Avê min destûra Feqe daya. Çi bêje re‘ayeta wî bika. Çunkî jî tirsê min daîman dile wî kul e, birîndar a. Daîman tirsê min jî çavê wî bi hêstir in. Îcar hêvîyan jê bika belkî rehmê li te bikê. Çi li te bike ‘esil ew a.”

*J’nû avê digot Feqhê delal  
Gorî te bê Rustemê Zal  
Te ez hiştim her kerr û lal  
Hêvî dikim j’te rehetê*

Ji nû av sîyasetî çûyê da. Got, “Feqhê delalî qenc, ez gorî te bim û sed wekî Rustemê Zal jî qurbana te bin. Min nizanîbû ku tu ev mêrê han î, ev ewlîyaê mezin î. Vêca min hêvî heya tu izna min bidî ez biborim. Eve min tobe li ber destê Xuda, ber destê te ku ez nehêlim deng ji nava min bê, ewa tu dibêjî ew deng ji kû da te tê. Ne destê te ne lingê te ne çengê

te ne perê te, ev mişmiş kû da te tê. Ez nahêlim deng ji nava min derkevê. Feqet ez hêvîya rehmê jî te dikim ku tu min berdî.” Feqe gotê, “Na, ew tiştê tu dibêjî tuna.”

*Feqe got Ava Mezin hîvya meka  
Tu siyaset û lêvka l’min meka  
Paşî vegera, xwe kar bika  
Lê dîsa here şikayetê*

Gotê, “Tu nikarî aqlê min qandirmîş bikî, tu sîyaseta bi min neka tu nikarî. Here dîsa vegere here şikayeta min cem Xuda bika, bê ne feqe ye, bê ne ‘alim e, haşa bê zalim e. Tu çi dikî tu bê minet î.”

*Şikayet bika, sebbê bika  
Sed cild kitêb zêde bika  
Tim tim bêbextîya bika  
Lê dîsa here şikayetê*

*Paşî vegere min ‘aciz meka  
Ji kahnî û çem û newala dengê  
xwe bika*

*Kevyên berfê zozanê banî xerab bika  
Lê tu hindik î were çêkin mîqatî*

Got, “Here avê, min ‘aciz meka, jî kahnî û çeman dengê xwe bika, her zozanê banî kevyên berfê xerab bika, tu hindik î xwe pîr bika, were ez û tu muca-deleta xwe em ê dewam bikin.”

*Avê gotê Feqê delal ez aşiq im  
Lakîn çi b’kim ne natiq im  
Ez ma’mûrê emre xaliq im  
Ah û fixanê muhbetê*

Got, “Feqhê delal, ez aşiqê cemala Xudê ma. Feqet ez çi bikim îro felek li serê min gerîyaya. Min kesî re neştexilîbû, jî wextê dinya avabûyî heya niha jî. Îcar keyfa min ji te ra hat min got de feqehe-

ke hema ez ê pê re du kelîman ştexilim, lê biborim. Ez jî bin emrê Xudayê ‘alemê da ma. Ew nalêna ku ji min têt tamam ji muhbeta Xuda ye. Îcar destûra min bida, ez ser rîya xwe herim, li binya Bexda heywanat tevî mana bej û fêkî û baxçe mane bej.” [Feqe] got, “Na, heke ez destûra te bidim tu dê wa herî şehr û beledan xwe bidê. Lazim e tu weke werîsê seqlê di nav pîyê min ra herî, biborî.” Heta îcar av hatîye peşko peşko di nav paqê wî ra borîye, heta av sawî buya. Avê jî tobe kirîye ber destê wî gotîye ez nehêlim deng ji nava min werê. Ava Mezin bêdeng e niha dibûhorê diçê.

Lingê xwe li ser avê ra derbaz kir, Feqê ma, bi rê ket qesda zozana kir. Wextê geha Zozana, ehlê Zozana, ji dora Warezîzê, pîreka Tûma bihîst

ku Feqe Mihemed wê hatîya. Ji Cizîra Botan serekî hatîya ka ez herim cem ka hal û wextê Tûma çawa ye. Pîreka wî hat, zarokê Tûma hatne dora wî, “Ezbenî Tûma çawa bû, halê wî çawa bû. Me bihîst xwe li Mîrê Bota girtîye.” Got, “Walla kirîvê Tûma, xelkê kuşt.” Wextê ku xelkê kuşt me’lûm e uzilmîş bûn, got, “Ecêba çi derdê wî, qebeheta çi bû.” Got, “Walla kirîvê” gote pîreka wî “bêbextî li xelkê kir û xaîntî li hevalê xwe kir û rabû xelkê kuşt. Xwedîyê wî di wê ‘eşîretê de kes nebû di wî beledî de, me’lûm e filhê me bû. Îcar ez jî rabûm ez bûme xwedîyê wî, min got lazim a ku em xwîna wîna bistînin. Îcar rabûn me xwîna wîna stand, çend qurûşî dane me, ji te ra, zarokê xwe ra mesref ka.” Pîreka wî çend quroşê xwe birin û çû.